# WANEYÊN MUZÎKÊ

KAMÎRAN ÎBRAHÎM



DIYARBAKIR BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ


Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV.KL.3453
03/10/2017
700 IBR WAN

# WANEYÊN MUZÎKÊ

Kamîran Îbrahîm



Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*
Reçu le 03/10/2017

Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
Konservatuara Aram Tigran
Huner: 1

**WANEYÊN MUZÎKÊ**

Kamîran Îbrahîm

**Edîtor**
Amed Çeko Jiyan

**Nivîsandina Notayan**
Herêm Cemal

**Lêanîna Bo Kurmancî**
Emîn Aba
Rûmet Riha Aydin

ISBN: 978-605-87650-8-5

Çapên Pirtûkê
Çapa Yekemîn: Enstîtuya Kelepûra Kurdî - Çapxaneya Şivan - Silêmanî
Çapa Duyemîn: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê - Amed, 2012

Çap
Atalay Matbaacılık San. ve Tic. Ltd.Şti.
Büyük Sanayi, 1. Cadde, Elif Sok. No:7/236-337
Tel: 0312 384 41 82 İskitler/ Ankara
Sertifika No: 15689

Serokatiya Daîreya Çand û Tûrîzmê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
Cadeya Elazixê Avahiya Xizmetê ya Şaredariya Bajarê Mezin AMED
Tel: 0 412 223 49 42 Fax: 0 412 229 30 52
e-poste: kultur@diyarbakir.bel.tr
web:www.diyarbakir.bel.tr www.turizm.diyarbakir.bel.tr
© Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê

Konservatuara Aram Tigran
Kampusa Perwerdehiyê ya Î. Halîl Kaya
Kêleka Garaja Mînîbusên Gundan Yenîşehîr / Amed
e-poste: konservatuar@diyarbakir.bel.tr web:http://konservatuar.diyarbakir.bel.tr
Tel: 0 412 226 10 14

Hemû mafên weşanê aîdî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ne.
Bêyî destûra Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bi tu awayî beşek jê yan jî bi tevahî nayê weşandin an jî zêdekirin.

Lîs Basın-Yayın Organizasyon Reklam San. Tic. Ltd. Şti.
Kooperatifler Mahallesi Öğretmenler Sokak. Feray Apt. No: 1
Yenişehir/Diyarbakır Tel: 0 412 228 97 76
www.wesanenlis.com wesanenlis@yahoo.com
Sertifika No: 20396

Institut kurde de Paris

NAVEROK


Waneya Yekem, 5
Waneya Duyem, 7
Waneya Sêyem, 11
Waneya Çarem, 14
Waneya Pêncem, 17
Waneya Şeşem, 21
Waneya Heftem, 23
Waneya Heştem, 25
Waneya Nehem, 27
Waneya Dehem, 30
Waneya Yazdem, 33
Waneya Duwazdehem, 36
Tebeqeyên Dengî (Qorên Dengî), 43
Hînker, 44
Sirûd û Stran, 63
Çend Parçe Muzîk, 85
Xişteya Ravekirina Hinek Têgehên Cihanî, 105
Çend Agahî Derbarê Hunermend De, 122



Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

**1. Pênaseya Muzîkê:** Ji hevgirtina wan dengên lihev ku di derûna mirovî de afirîn pêk tê û di jiyana mirovan de berbiçav dibe. Bêjeya muzîkê ji bêjeya bi Yewnanî "miyuz"ê tê ku "miyuz" di efsaneyên Grekan(Yunana Kevnar) de yek ji xwedawendên helbestê ye.

Wateya terma muzîkê di roja îroyîn de ji ya serdema kevnar cuda ye, ji ber ku peyva muzîkê ji aliyê Grekan ve, bi wateya "hunereke berfireh" dihat bikaranîn û ji gelek warên hunerê; helbest, sema, şano, stran û amûrlêdanê pêk dihat, lê di serdema me de, tenê ji bo stran, kilamgotin û lêdana amûrên cur bi cur tê bikaranîn.

**2. Muzîk Zimanekî Cîhanî ye:** Çawa ku zimanê axaftinê yê asayî ji bo rastnivîsa peyv, hevok, babet, rapor û...hwd xwedî tîp û nivîsên taybetî ye, zimanê muzîkê jî ji bo nivîsandina awaz û parçeyên muzîkê, xwedî nîşaneyên taybet e û ew nîşane jî bi nîşaneyên muzîkê, dengên muzîkê yan jî pileyên muzîkê têne binavkirin.

**3. Nîşaneyên Muzîkê:** Grekî yekem gel bûn ku tîpên alfabeyê ji bo bilindî û nizmiya dengan bi kar anîne. Piştre Romayiyan ji wan wergirtin û navê "heft tîpên Latînî" lê kirin. Niha ev tîpên muzîkê li Almanya, Brîtaniya û Amerîkaya Bakur têne bikaranîn. Ew jî ev in:

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| A | B | C | D | E | F | G |
| La | Sî | Do | Re | Mî | Fa | Sol |

Institut kurde de Paris

Quido Arisoi karî hin guhertinan di nivîsên wî cureyî de bike ku berê di rewacê de bûn. Û bi riya vê şêwaza nû karî perwerdeya muzîkê bi hêsanî bide û belav bike. Ev rê jî ji alfabeya muzîka latînî cuda bû, ku ji her birgeyên yekem ên seredêrên stranên tertîliyên olî yên Maryu Hinna Me'emedanî derxistibû ku bi zimanê Latînî hatibûn nivîsandin. Û hemû tertîlbêjan ew dizanîn.

SIRÛDA MARYO HINNA ME'EMEDANÎ

| | |
|---|---|
| Ji bo ku bi bêhnfirehî bêhna xwe vedî | Ut queant laxis |
| Jî têne lêxistin (Li jiyan tê dan) | Resonare fibris |
| Bûyerên sosret | Mira gestorum |
| Berdest | Famuli tuorum |
| Li gunehên wan xweş be (Li gunehên wan bibore) | Solve polluti |
| Çakbûna gunehên wan | Labii reatum |
| Ey Yohenna yê pîroz | Sancte Iohannes |

Ji ber ku, her dêrehelbestek (rêzika helbestekê) bi awayekî ji jêr ber bi jor ve dest pê dike; yanî pile bi pile û li gorî peyjeya mezin, ji ber vê jî destpêka wan dêran hatiye helbijartin ku bi vî awayê li jêr tê nivîsandin.

Kîteyên yekem ên serêdêran bûne navê heft dengên muzîkê:

Ut Re Mî Fa Sol La Sî

"Ut" bûye dengê yekem ê peyjeya muzîkê ku heta îro jî li Fransayê tê bikaranîn.

Lê belê ji sedeya şazdemîn û vir de İtaliyan ev peyv guhartiye "Do" yê, ji ber ku gotina wê siviktir e.

Do Re Mî Fa Sol La Sî

Institut kurde de Paris

## WANEYA DUYEM

**Pêlekanên Muzîkê (Stave)**

Dengên muzîkê di pênc xet û çar valahiyan de têne nivîsandin, weke mînaka li jêrê:




Kilîl, nîşaneyek e ku li destpêka pêlekana muzîkê tê danîn.

Kilîl, ji bo diyarkirina tebeqeya (qora) dengekî, weke navê wê xetê tê bikaranîn, bi pişt re bi rêya wan dengên din li ser pêlekanên muzîkê têne zanîn. Di nivîsandina muzîkê de sê cure kilîl têne bikaranîn.

Kilîla Sol (Sol) 

Kilîla Fa (Fa) 

Kilîla Do (Do) 

**Kilîla Sol:** Ji bo dengên tîj tê bikaranîn. Di strandinê de ji bo stranbêjên jin û zarokan tê bikaranîn. Ji bo diyarkirina wan dengên ku li xeta duyem in tê danîn, ku ev dengê Sol'e.




Her wiha ji bo van amûran tê bikaranîn; keman, filut, buzq, trampet û hwd... Û di piyano û orgê de ji bo destê rastê tê bikaranîn. Tiştê girîng di vir de ew e ku nivîsandina muzîkê li ser pêlekanê ji aliyê çepê bo aliyê rastê (weke nivîsandina latînî) dest pê dike.




A-Nivîsîna li ser xetên pêlekanên muzîkê




B-Nivîsîna li ser valahiyên pêlekanên muzîkê

Institut kurde de Paris

**Xetên Alikar Ên Kilîla Sol'ê:**

Ew xetên ku li aliyê jor ê pêlekana muzîkê û li aliyê jêr ê pêlekanê ne ji bo nivîsandina dengên muzîkê li ser, li nav yan jî li jêra wê ji bo zêdekirina tûjî yan jî kêmkirina stûriyê li derveyî pênc xetan têne danîn:




**Kilîla Fa** 𝄢

Ev kilîl ji bo dengên stûr tê bikaranîn û di strandinê de, ji bo stranbêjên mêr e. Ev kilîl dikeve ser xeta çarem a pêlekanê û wan hemû dengan destnîşan dike ku dikevin ser xeta çarem, ku ev hemû dengê "fa"yê ne. Piyano û org dema ku bi destê çepê têne jenandin kilîla fa'yê tê bikaranîn. Her wiha ji bo çelo û basonê jî tê bikaranîn.




A- Nivîsîna li ser xetan:




B- Nivîsîna li ser valahiyan:




**Xetên Alikar ên Kilîla Fa' yê:**




Institut kurde de Paris

**Kilîla Do**

Ew jî pênc kilîlên parvekirî ne li ser her pênc xetan, ku berdewama Do'ya navîn nîşan dide. Li ser xeta pêlekana sêyemîn e.




**Cureyên Kilîla Do'yê:**

Kilîla Do'yê li ser xeta çarem:

Ji bo dengên bilind ên çelo û bason, ji bo Trambona tûj (tenor), her wiha ji bo tenora bilind û stranbêjên mêr tê bikaranîn.





Kilîla 'Do' yê li ser xeta sêyem ji bo vîyola û ji bo dengên stûr ên stranbêjên Alto û kontr alto tê bikaranîn.

Kilîla 'Do' yê li ser xeta duyem ji bo veguhastinê tê bikaranîn; lê belê îro rêberê orkestrayan bi tenê ji bo 'Trenpêtan' kilîla Fa'yê (French Horn) bi kar tînin.




Kilîla 'Do' yê li ser xeta yekem ji bo dengên bilind ên stranbêjên jin (Soprano) tê bikaranîn.




**Note:**

Ew nîşaneyên dengî ne ku bi rêya pileyan bandorê li derûniya mirov dikin. Her dereceyek ji dereceyên pêlekana muzîkê, bandoreke diyarkirî li derûniya mirovan dike. Ji ber vê yekê bandor li gorî van bingehan hatine rêkxistin:

Institut kurde de Paris

**Do**: Behsa hêza camêriyê dike. Bi girtina (nuqandin) dest bi şêweyekî, ku çepil berê xwe bi aliyê sitûna jêr ve dike.

**Re**: Behsa dilovanî, hêvîkerî (tikakarî) û pirsiyarê dike. Bi vekirina dest, bi awayekî ku kefên destan ber bi jor ve bin û çepil li tenişta bedenê (laş) bin, bi awayekî ku sî pileyî çêbike tê rêkxistin.

**Mî**: Behsa rehetî û aramiyê dike. Bi vekirina dest bi awayekî ku berê kefa destan li jêrê be û çepil li tenişta bedenê bin, berwar tê sererastkirin; çawa ku di werzişa Swêdî de tê dîtin.

**Fa**: Behsa xem, goşegîrî û tenêtiyê dike. Nizimkirina tiliya eşhedê ber bi jêr ve û girtina tiliyên din bi awayekî ku tenê tiliya eşhedê ji yên din cuda be.

**Sol**: Behsa, xurtî û çalakî û dilxweşî û vekirîbûnê dike. Bi dirêjkirina çepilan ber bi paşiyê ve, bi awayekî ku kefê destan ber bi jor ve bin û tilî nêzîkî hev bin, ji tiliya "tune" pê ve.

**La**: Behsa girî û şînê dike. Bi sistkirina destan, bi awayekî ku tilî nêzikî hev bin û berê wan li jêr be, bi awayekî ku dirûvê dara şengebiyê pê bikeve.

**Sî**: Behsa çavnêrî û dilhebûnê dike, ji ber ku guhdar çaverêyê bihîstina radeya duyem e ji peyjeya muzîkê. Ji ber vê yekê jêbehskirin, bi berjêrkirina tiliyan dibe, ji tiliya "tune" pê ve ku jor nîşan dide; lê çepil li hewa ye weke çepilê xwendekarekî/ê ku tiliya xwe ji bo pirskirinê bilind kiribe.

**Do**: Dîsa behsa hêz û dilawertiyê (wêrekiyê) dike. Bi bilindkirina çepilan ber bi jor ve çêdibe. Weke ku miroveki/ê ji bo bersivdanê destê xwe bilind kiribe.

Institut kurde de Paris

## WANEYA SÊYEM

Navber û cure (Interval) ji bo muzîka rojhilatî taybet in.

**Pênaseya Navberê**

Ji dûriya di navbera du dengên ku li pey hev tên pêk tê.

1- **Navbera Mezin:** Ji nîv-mesafeya temam pêk tê. Beranberî çar çarîkan e. Nîşaneya wê bi vî awayî ye.

(  )

2- **Navbera Biçûk:** Ji nîv-mesafeyê pêk tê. Beranberî du çarîkan e. Nîşaneya wê bi vî awayî ye.


(  )

3- **Navbera Navendî:** Ji mesafeyeke bi sê çarîkan pêk tê. Beranberî sê çarîkan e. Nîşaneya wê bi vî awayî ye. (  ) Ev navber di muzîka rojavayî de tune ye.

4- **Navbera Fire:** Ji navber û nîvekê pêk tê. Beranberî şeş çarîkan e. Nîşaneya wê bi vî awayî ye.

(  )


**Mînaka Ravekirinê:**





Institut kurde de Paris





**Peyjeya Mezin:**





**Peyjeya Biçûk:**




**Peyjeya Rojhilatî (Rast):**




**Peyjeya Rojhilatî (Hîcaz):**






**Peyjeya Muzîkê (scale):**

Ji zincîreya dengên ku li pey hev tên pêk tê. Her dengê ku dest pê dike, di dengê heştem ê tûj de dawî lê tê (octave).

Institut kurde de Paris


**Mînak:**




**Peyjeya Mezin (major scale):** Di muzîka rojhilatî de, bi navê Meqama Ecem tê nasîn.

**Mînak:**





**Mînaka bi Îngilîzî:**

| DO | | RE | | MÎ | | FA | | SOL | | LA | | SÎ | | DO |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | Ton | | Ton | | Semition | | Ton | | Ton | | Ton | | Semition | |

Her peyjeyek ji du komenotên wekîl pêk tê û her komek bi "çarîleyan (tetra chord)" tê nasîn. Her çarîle jî ji çar dengan an noteyan pêk tê.

**Pileya cudakar (tone of disjunction):** Em dikarin bibêjin çarîleya jor ji çarîleya jêrê bi navbereke mezin cuda dibe ku jê re dibêjin "cudakara mesafeyê" yan jî "pileya cudakar" (tone of disjunction).

**Mînak:**





Institut kurde de Paris

## WANEYA ÇAREM

**Awayên Nîşaneyên Sade yê Demî di Muzîkê De**

| | Kurdî | Îngilîzî | |
|---|---|---|---|
| | Yekpar | semibreve | 4 lêdan |
| | Dupar | Minim | 2 lêdan |
| | Çarpar | crotchet | 1 lêdan |
| | Heştpar | Quaver | 1/2 lêdan |
| | Şazdepar | semi quaver | 1/4 lêdan |
| | Sîûdupar | demi semi quaver | 1/8 lêdan |
| | Şêstûçarpar | hemi demi semi quaver | 1/12 lêdan |

1- Nivîsîna Yekpar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



2- Nivîsîna Dupar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



3- Nivîsîna Çarpar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



4- Nivîsîna Heştpar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



5- Nivîsîna Şazdepar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



Institut kurde de Paris

6- Nivîsîna Sîûdupar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



7- Nivîsîna Şêstûçarpar'ê Li Ser Pêlekana Muzîkê



**Nirxa Demî ya Nîşaneyên Muzîkê**

**Pênase**: Nirxa demî ji maweya domkirina şêweyekê ji şêweyan bi dirêjî û kurtiya xwe pêk tê.

**Yekpar** : Ji demeke temam pêk tê ku ya herî dirêj e.

**Dupar** : Ji nîv demeke temam pêk tê; ango nîvê yekpar'ê ye.

**Çarpar** : Ji çarîka demî ya temam pêk tê; ango her yekparek beranberî çar çarpar'an e.


**Heştpar** : Yekparek beranberî heşt heştpar'a ye.

**Şazdepar**: Ji demiya ji şanzdehan yek(1/16) temam pêk tê: Yekparek beranberî şanzdeh Şazdepar'a ye.

**Sîûdupar**: Ji demiya ji sî û duduyan yek (1/32) temam pêk tê: Yekparek beranberî sî û du sîûdupar'a ye.

**Şêstûçarpar**: Ji demiya ji şêst û çaran yek(1/64) temam pêk tê: Yekparek beranberî şêst û çar şêstûçarpar'a ye.

Institut kurde de Paris



## Nîşaneyên Demî yên Xaldar

### Nîşaneyên Xaldar:

Ji danîna xalan li aliyê rastê, li jora her noteyekê ku dibe sedema zêdebûna nîv-nirxa demî ya serekiya xwe pêk tê ango nirxa noteya xaldar beranberî sê noteyên piştî xwe ye di biçûkatiyê de, ji dêvla du noteyan ve.

| | | |
|---|---|---|
| Dupar'a xaldar | . 𝅗𝅥 - 𝅗𝅥 + ♩ | = 3 lêdan |
| Çarpar'a xaldar | . ♩ - ♩ + ♪ | = 3/2 lêdan |
| Heştpar'a xaldar | . ♪ - ♪ + 𝅘𝅥𝅯 | = 3/4 lêdan |
| Şazdepar'a xaldar | . 𝅘𝅥𝅯 - 𝅘𝅥𝅯 + 𝅘𝅥𝅰 | = 3/8 lêdan |

**Destûr**: Her xalek ku piştî her noteyekê bê danîn, bi qasî nîv nirxa demî li nirxa dema serekî zêde dike.

### Nîşaneyên Demî yên Cotexalan

Eger du xal(cotexal) li alîyê rastê yê noteyê bê danîn, xala duyem nîvê nirxa dema xala yekem zêde dibe.

**Mînak:**

| | | |
|---|---|---|
| 𝅝 - 𝅝 + 𝅗𝅥 + ♩ | = | 7 lêdan |
| 𝅗𝅥 - 𝅗𝅥 + ♩ + ♪ | = | 3.1/2 lêdan |
| ♩ - ♩ + ♪ + 𝅘𝅥𝅯 | = | 1.3/4 lêdan |
| ♪ - ♪ + 𝅘𝅥𝅯 + 𝅘𝅥𝅰 | = | 7/8 lêdan |

Institut kurde de Paris

## WANEYA PÊNCEM

**Nîşaneyên Guhartinê:**

Hinek nîşaneyên ku şêweyê wan taybet e hene; wekî "nîşaneyên guhartinê" têne nasîn. Ger li aliyê çepê yê her noteyekê bêne danîn, dibin sedema bilindkirin an nizmkirina wan dengan.

Nîşaneya bilindok (berzok) (diyez) (sharp), bi frensî (Diêse)

Nîşaneya nizmok (bemol), bi frensî (Bêmol)

Nîşaneya xwezayî (bîkar), bi frensî (Bêccare)

1- Nîşaneya bilindok # (diêse) deng nîv pileyî bilind dike.

2- Nîşaneya nizmok ♭ (bêmol) deng nîv pileyî nizm dike.

3- Nîşaneya rastok ♮ (beccare) deng vedigerîne ser awayê xwe yê xwezayî.

4- Cotebilindok × (double diesse) deng pileyeke temam bilind dike.

5- Cotenizmok ♭♭ (double bemol) deng pileyeke temam nizm dike

Her wiha di muzîka rojhilatî de hinek nîşaneyên din hene. Weke:

a- Nîv bilindok (berzok) ‡ Çarîkekê pileya deng bilind dike.
b- ¾ berzok ♯ Sê çarîkan pileya deng bilind dike.
c- Nîv nizmok ♭ Çarîkekê pileya deng nizm dike.
d- ¾ nizmok ♭ Sê çarîkan pileya deng nizm dike.

**Nîşaneyên Guhartinê Du Cur in:**

1- Nîşaneyên sereke ku rasterast li paş kilîlê têne danîn bandorê li ser tebeqeya (qora) dengê hemû parçe muzîkekê dike. Îcar ew deng Bas be, Tenor, Alto yan jî Soprano be ferq nake.

Institut kurde de Paris

**Mînak:**




2- **Nişaneyên Guherina Ji Nişke Ve (Accidentals):** Ew nîşane tenê bandorê li tebeqeya dengên yekxane dike. Her wiha bandorê li tebeqeya dengê yekxet an yekvalahî dike.

**Mînak 1**



**Mînak 2**



3- **Nîşaneya Rastok (becarre):** Tenê bandorê li wê tebeqeya dengan dike ku tê de hatiye nivîsandin.

**Mînak:**


**a-**




**b-**




**c-**




Institut kurde de Paris

**Rêberê Peyjeyê (key - signature) - Rênase**

Li destpêka dêra yekem a pêlekana muzîkê û li paş kilîlê tê danîn. Bandora nîşaneyên guhartinê, hemû xaneyan vedigire.

**Mînak:**

Rêkxistina Bîmolan



Rêkxistina Dîêzan




**Têbînî:** Her peyjeyekê di muzîkê de, rêberê peyjeya taybet ya xwe heye.

**Mînak:**

1- Rêberê peyjeya "sol" a mezin (G.Major)

G.Major



2- Rêberê Peyjeya "fa"ya mezin (F.Major)

F.Major



**Nîşaneyên Bêhnvedanê (rests)**

Carna jenîn (lêdan) an strandin ji bo bêhngirtin, vehesîn an jî qedandina parçeyên muzîkan radiweste. Ji ber wê yekê hin nîşane hene ku jê re bêhnvedan tê gotin ku di navbera noteyan de û li ser pêlekanên muzîkê têne danîn ji bo diyarkirina ciyê bêhnvedanan. Beranberî şêweya her noteyekê, nîşaneyeke taybet a bêhnvedanê heye ku ji aliyê demê ve wekhev in. Weke mînaka li jêrê:

| Rawesa Yekpar | Rawesa Dupar | Rawesa Çarpar | Rawesa Heştpar | Rawesa Şazdepar | Rawesa Sîûdupar | Rawesa Şêstûçarpar |
|---|---|---|---|---|---|---|



Institut kurde de Paris

**Rawesên Xaldar:**

Her xaleke ku li aliyê rastê yê bêhnvedanan tê danîn, nîvê dema bêhnvedanê dirêj dike. Weke mînaka li jêrê:

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Rawesa | Rawesa | Rawesa | Rawesa | Rawesa | Rawesa | Rawesa |
| Yekpar | Dupar | Çarpar | Heştpar | Şazdepar | Sîûdupar | Şêstûçarpar |
| Xaldar | Xaldar | Xaldar | Xaldar | Xaldar | Xaldar | Xaldar |



**Têbînî:** Nabe ji bo bêhnvedanên Yekpar û dupar xal bê danîn. Her wiha ji bo dirêjkirina dema bêhnvedanan kevana zeliqandinê nayê bikaranîn.

Institut kurde de Paris

## WANEYA ŞEŞEM


**Yekem:**

**Xaneya Muzîkê (Measure):** Ji çend komên noteyan pêk tê ku ev kom ji aliyê dem ve wekhev in.

**Duyem:**

**Parçeyê Muzîkê:** Ji çend xaneyan pêk tê ku her xetekê şaqulê wan ji hev cuda dike ku jê re "xeta xaneyê" tê gotin. Dawiya wê koma xaneyan bi du xetan tê ku jê re "cote-xeta xane'"yê tê gotin.

**Mînak:**




**Sêyem: Kêş di Muzîkê de:**

Kêş (Pîvan): Ew sazkara ku rêrewa awazên muzîkal diyar dike û bi ser çend komedemên wekhev de tê dabeşkirin û lêdana (tirpeya) bihêz û bêhêz a her yek ji wan koman xuya dike.

Di her xaneyekê de çend komên lêdanê yên rêkxistî hene, koma lêdanan an duyane ye an sêyane ye an çarane ye hwd.

Lêdana (tirpe) yekem di her komekê (xane) de ji lêdanên din bihêztir e.

a- Ger di her xaneyekê de koma lêdanan duyane bin:

Lêdana yekem: Bihêz (strong)

Lêdana duyem: Bêhêz (week)


Di vî cureyî de bi kêşa duyane tê binavkirin.

**Têbînî:**

"Bi" wate bihêz
"Bê" wate bêhêz
"Nid" wate mam-navendî

Institut kurde de Paris

**Mînak:**





Ger di her xaneyekê de koma lêdanan sêyane be:

Lêdana yekem: Bihêz

Lêdana duyem: Bêhêz

Lêdana sêyem: Bêhêz

**Mînak:**




Ger di her xaneyekê de koma lêdanan çarane bin:

Lêdana yekem: Bihêz

Lêdana duyem: Bêhêz

Lêdana sêyem: Navendî

Lêdana çarem: Bêhêz

**Mînak:**




**Çarem: Rêberê Kêşê:** Ji du jimareyan pêk tê; jimareya yekem li jorê ye, ya duyem jî li jêrê ye.

Jimareya jor, jimareya lêdanan di her xaneyekê de diyar dike.

Jimareya jêr, awayê lêdanan di nava xaneyekê de diyar dike.

**Têbînî:** Cureya lêdanan her dem beşeke asayî ne di yekparê de.

Institut kurde de Paris

## WANEYA HEFTEM

### Komkirina Noteyên Dûvdar

Du heştparan di xetekê de kom dikin ( ), ew xet jî bi awayê yekdûv tê nîşandan. ( ).

Du şazdepar bi du xetên terîb têne komkirin (têne danîn) ( ), ev du xet jî bi awayê cotedûv tê nîşandan. ( ).

Bi vê şêweya noteya sêdûv (sîûdupar) bi sê xetên terîb, her wiha noteya çardûv (şêstûçarpar) jî bi çar xetên terîb tê nîşandan.

**Mînak:**






Mebest ji komkirina çipa(ling) noteyên dûvdar, ji bo hêsanbûna nivisîn û xwendina parçeyên muzîkê ye. Li şûna wan noteyên jêr ên jevqetî (jêkqetî) em noteyên komkirî dinivîsin.

**Mînak:**

Jevqetî



Girêdayî




**Arasteya Çipan:**

Ger her noteyek ket jora xeta navîn a pêlekana muzîkê, divê berê çîpê (lingê) wê ber bi jêr bibe.

Lê ger kete jêr xeta navîn, divê berê çîpê wê ber bi jor ve be. Her wiha ger li ser xeta navîn be, dikare ber bi jêr an ber bi jor bibe. Weke di mînaka jêr de xuya dike:

Institut kurde de Paris

**Mînak:**




Ger komeke noteyên Heştpar, Şazdepar û hwd. bi hev re bin, hîngê berê çîpên noteyan li gorî dûrtirîn noteya xeta navîn dibe.

Nexwe ji ber hindê ne girîng e ku noteyên din bikevin jor an jêra xeta navîn.

**Mînak:**

Noteya Fa di xeta navîn de ya herî dûr e.



Noteya Sol di xeta navîn de ya herî dûr e.



**Têbînî:** Armanc ji wan, tenê xweşikiya nivîsê û rêk û pêkiya wan e.

Institut kurde de Paris

## WANEYA HEŞTEM

### Kêşa Sade (simple Time)

Ew kêşa (pîvana) ku lêdanên wê bi rêyeke destûrî bi ser du beşên yeksan (wekhev) de parve dibin.

**Mînak:**



**Têbînî:** Kêşa $\frac{2}{8}$ kêm tê bikaranîn.

Carna nîşaneya ( C ) yê li cihê ( $\frac{4}{4}$ ) tê danîn û hin caran nîşaneya ( ¢ ) li cihê $\frac{2}{2}$ 'yê yan jî $\frac{4}{2}$ tê danîn.

a- Ger yekeya demî Yekpar be nîşaneya wê dibe 1, ji ber ku nîşaneya herî mezin a demî ye.

**Mînak:**

**4, 3, 2**

**1 1 1**

b- Ger yekeya demî Dupar be, nîşaneya wê dibe 2, ji ber ku di yek Yekpar'ê de, du Dupar hene.

**Mînak:**

**4, 3, 2**

**2 2 2**

Institut kurde de Paris

c- Ger yekeya demî Çarpar be, nîşaneya wê dibe 4, ji ber ku di yek Yekpar'ê de, çar Çarpar hene.

**Mînak:**

**4, 3, 2**

**4 4 4**

d- Ger yekeya demî Heştpar be nîşaneya wê dibe 8, ji ber ku di yek Yekpar'ê de, heşt Heştpar hene.

**Mînak:**

**4, 3, 2**

**8 8 8**

Di hemû mînakên bêhnvedanê de her lêdanek, eger Heştpar, Çarpar an Dupar be, ew bi ser du beşên yeksan (wekhev) parve dibe.

**Mînak:**

Lêdana Çarparê bi ser du beşên yeksan (wekhev) de parve dibe.
Lêdana Duparê bi ser du beşên yeksan de parve dibe.
Lêdana Heştparê bi ser du beşên yeksan de parve dibe.

**Encam:** Her lêdanek li du beşên yeksan parve bibe, vêca em dikarin bibêjin ev kêşa sade ye.

**Têbînî:** Hemû cureyên lêdanan beşeke asayî ne di Yekparê de.

Institut kurde de Paris


## WANEYA NEHEM

### Kêşa Hevbend/ /Pevgirêdayî (Compound time)

Kêşa ku lêdanên wê bi riyeke nedestûrî li sê beşan parve dibe.

Sêko/Sêyîne (triple): Sê note ne ku bi awayekî nedestûrî hatine komkirin. Di encama parvebûna lêdanekê bi ser sê beşan de çêbûye da ku eşkere bibe ku ev note nedestûrî ne. Dibe hejmara 3'yan li jêrê yan jî li jorê noteyê bê danîn, bi xeteke çemiyayî (kelkot ) ( ) yan jî kevana girêdanê ( ) bê nîşandan. Ji bo ku ji kevana zeliqiyayî bê cudakirin divê wêneyê wê bi vî awayî bê çêkirin ( ).

**Mînak:**




**Kêşa Sade ya Nedestûrî:**

Ji bo em vê parvebûnê bikin destûrî, divê em li beramberî her noteyeke "sêko" noteyeke 'xaldar' deynin.

**Mînak:**



**Kêşa Hevbend A Destûrî:**

**Mînak:**



**Kêşa Sade Ya Nedestûrî:**

**Mînak:**



Institut kurde de Paris

**Kêşa Hevbend a Nedestûrî:**

**Mînak:**



Şêweya 1'ê kêşa duyane ya sade bi lêdana Çarpar.

Şêweya 2'an kêşa duyane ya hevbend bi lêdana Çarpara xaldar.

Şêweya 3'an kêşa sêyane ya sade bi lêdana Heştpar.

Şêweya 4'an kêşa sêyane ya hevbend bi lêdana Heştpara xaldar.

Di vir de em dikarin bibêjin ger lêdanên her kêşekê xaldar bin, ev kêş kêşeke hevbend e.

**Mînak:**

$$\frac{12}{8} \div \frac{3}{2} = \frac{4}{4}$$

Wateya vê ev e: çar lêdana xaldar

**Encam:** Kêşeke hevbend a Çarpara xaldar.

**Têbînî:**

Kêşa Sade: Lêdanên sade ne.

Kêşa Hevbend: Lêdanên xaldar in.

Ji bo zanîna hejmara lêdanan, her xaneyeke kêşa hevbend, divê hejmara jor li hejmara 3'an bê parvekirin.

Her wiha ji bo zanîna cureya lêdanan di her xaneyekê de, divê hejmara jêr li hejmara 2'an bê dabeşkirin.

Institut kurde de Paris

**Xişteya Kêşên Hevbend :**



Ger em bixwazin di kêşa sade de, kêşa hevbend bi dest bixin, hejmara li jorê divê li 3'an bê carkirin û hejmara li jêrê, li 2'an bê carkirin.

**Mînak:**

| | | | |
|---|---|---|---|
| 3 x 3 = 9 | 2 x 3 = 6 | 2 x 3 = 6 | 4 x 3 = 12 |
| 8 x 2 = 16 | 4 x 2 = 8 | 2 x 2 = 4 | 4 x 2 = 8 |

Institut kurde de Paris

## WANEYA DEHEM

**Nîşaneyên Veger û Dubarekirinê:**

**Ropriz (Roprise)**

**A. Cotxalên Dubarekirinê:** Ji du xalên stûn ku li pişta wan du xetên stûn hene pêk tê. Ev nîşane ji bo dubarekirina parçeyê muzîkê tê bikaranîn; carekê di serî de digihêje vê cotxalê.

**Mînak:**



Beşa yekem du caran tê xwendin    Beşa duyem carekê tê xwendin

**B. Cotxeta stûnî:** Li dû de cotxala stûnî, bi piştre cotxala stûnî li dû de cotxeta stûnî. Ev nîşane jî ji bo dubarekirina parçeyê muzîkê tê bikaranîn; carna ji cotxeta yekem heta cotxeta duyem.



Beşa yekem carekê tê xwendin    Beşa duyem du caran tê xwendin

Di mînaka di pêş de, li ser qevzdana (bazdana) xaneya yekem jimara 1'ê hatiye danîn. Di dema dubarekirin û jenîna xaneya duyem de ku jimara 2 li şûna xaneya yekem li ser hatiye nivîsîn.

**Mînak:**




**Têbînî:**

Ji jimara 1 re dibêjin (Prima volta) ya cara yekem.
Ji jimara 2 re dibêjin (Seconda volta) ya cara duyem.

**C. Senyo ( 𝄋 ):** Kengê ku nîşaneya ( 𝄋 ) bi berçavê we ket, ji nîşaneya yekê ( 𝄋 ) heta peyva Fine'ê cara yekem parçeyê muzîkê dubare dibe.

Institut kurde de Paris




beşa yekem beşa duyem

**D. Decapo D.C:** Ji du peyvên bi Îtalî (Da capo) pêk tê. Wateya wê ev e: Vegera ji serê parçeyê muzîkê heta peyva Fine'ê.

Dumahî Dubare ji destpêkê ve




( / ) : Dubarekirina nîv xaneyê.

( 𝄎 ) : Dubarekirina xaneyekê.

( 𝄏 ) : Dubarekirina du xaneyan.

**Mînak:**

dubarekirina nîv xaneyê dubarekirina xaneyekê



dubarekirina du xaneyan



**E. ( 𝄌 ) Koda:** Dema dubarekirinê bi nîşaneya ( 𝄋 )'ê ji ser nişaneya ( 𝄌 )'ê yekem re qevzdidin ser ( 𝄌 ) duyem dibin.

**F. Nişaneya ( 8va ):** Ji bo veguhastina noteya muzîkên ji oktavekê jortir tê bikaranîn.

**Mînak:**




tê nivîsandin tê xwendin

Institut kurde de Paris

Hejmara 8'an jimareyeke îngilîzî ye, her wiha "va" kurteya peyva octava'yê ye.

**G. (8ve Basse):** Ji bo nizimkirina noteyê bo oktavekê tê bikaranîn.

**Mînak:**




Institut kurde de Paris

## WANEYA YAZDEM

**Kevana Zeliqandinê:**

**Kevana Zeliqandina Demî:** Ew xeta çemiyayî ku li jorê yan jî li jêrê du noteyên ku li ser tebeqeyekê (qorekê) tê danîn û bi dengekî tê xwendin an jî tê jenîn.



**Cureyên Kevana Zeliqandinê**

α– **Kevana Zeliqandina Demî ya Xwezayî:** Ev kevan ji bo du noteyan an jî zêdetir tê bikaranîn ku li ser tebeqeyekê nirxeke demî hebe.

**Mînak:**




β– **Kevana Zeliqandina Demî ya Nexwezayî (Şaz):** Heman kevan e, lê ji bo du noteyan an zêdetir tê bikaranîn ku li ser heman tebeqeyê bin, lê nirxa demiya wan cuda be.

**Mînak:**



**Têbînî:** Carinan kevana zeliqandî ya xwezayî û ya ne-xwezayî têne cem hev, weke vê mînaka li jêrê:




χ– **Kulek/Syncope:** Ew kevana ku ji bo du noteyan tê bikaranîn ku ya yekem jî lêdana bêhêz û ya din jî ji lêdana bihêz pêk tê ku bi hev re û bêrawestan bêne jenîn. Ev cure weke veguhastin tê binavkirin. Mebest ji wê ew e ku ciyê lêdana bêhêz vediguhezîne bo lêdana bihêz di bin bandora kevana zeliqandinê de ku her du jî dibin lêdana bêhêz.

Institut kurde de Paris

**Mînak:**

Dema Nexwezayî Dema Xwezayî



Ji vê şêwazê re dibêjin "lêdana korkî" ku ji guhartina ciyê lêdanan pêk tê. Ji bo guhartina lêdana bihêz, carna nîşaneya "guşar (zext)"ê (>) (accent) li ser lêdanên bêhêz ji bo guhartina wan bo lêdanên bihêz tê danîn.

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

**Mînak:**

b-





Institut kurde de Paris

**c- Kevana Zeliqandina Melodiyê:** Kevana ku li jêrê yan jî li jorê çend noteyan tê danîn ku ji aliyê tebeqe (qor) û demê ve cuda ne ku dibe sedema ranewestana dengên li pey hev ên ku di dema lêxistin an strandinê de hatine.

**Mînak:**



**Lêdanên Demî yên Bihêz û Bêhêz û Dije-lêdanê:**

**Lêdana Demî ya Bihêz:** Ciyê noteyên bihêz di nav xaneyê de diyar dike ku lêdana yekem e di her xaneyekê de. Li beranberî wê, dengekî bihêz ê rîtmîk heye ku jê re dibêjin Dim.

**Mînak:**




**Lêdana Demî ya Bêhêz:** Li pey her lêdana bihêz tê di her xaneyekê de ku hêza wê kêmtir e ango bêhêz e. Li hemberî wê, dengekî bêhêz ê rîtmîk heye ku jê re dibêjin "tak".

**Mînak:**




**Dije-lêdana Demî (contre lems):** Ji lêxistina dengekî bêhêz pêk tê ku bêhnvedanek li pêşiyê heye, bi mebesta veguhastina ciyê lêdana bihêz bo ciyê lêdana bêhêz ku ciyê wê bi bêhnvedanê pir dibe.

**Mînak:**




Institut kurde de Paris

## WANEYA DUWAZDEHEM

### Liva Rêkkariya Demî

**Di Muzîkê de Dem:**


Di dirustkirina muzîkê de, dem û dengê muzîkî, du pêkhateyên sereke ne ku muzîka cîhanê ji wan pêk tê. Dengên muzîkî yên ku ji amûrên cuda û ji qirika mirovan derdikevin - ku bêgûman demek ji bo berdewamiya wan dengan heye - awa û nîşaneyên nivîsîna muzîka wan, girêdayî wê demê ne ku digel awa û nîşaneyên wan tê.

Her ku ev nîşane ( 𝅝 ) hate dîtin, divê bê zanîn ku ev nîşaneya Yekpar'ê ye û hejmara lêdanên çarane ye, her wiha ger nîşaneya ( 𝅗𝅥 ) hate dîtin, ev jî Dupar e û ew hejmara lêdanên duyane ye hwd.

**Tevgera Vegirtina Demî:** Ji yekeyeke pîvaneya livandinê ku ji bo sazkirina demî ya şêwe û nîşaneyên muzîkê tê bikaranîn; her wiha ji bo xwendineke rastîn a awaza stran û amûran de kar li ser tê kirin.

**Awayê Karkirinê Digel Rêkkara Demî:**

1- Dawiya kefa dest tê cîgirkirin yanî zend, piştre dest ji jor ber bi jêr tevdigere.
2- Dest ji jorê ve ber bi jêrê zendî ve tevdigere; bi wî awayî me nîvê tevgerê pêkanî.
3- Dest vedigere bo aliyê jorê, weke rewşa xwe ya asayî û bi wî awayî bi me tevgera temam pêkanî. Weke ku li jêrê hatiye nîşandan:




**Têbînî 1:** Hemû tevgerên temam ên dest, yeksan in bi demeke temam. Wate, yekeya demî ya temam.

**Têbînî 2:**

**a-** Her Çarparek ( ♩ ) yeksan e bi liveke temam. Wate, du arasteyan ↓↑ ango beramberî wê di rêberê kêşê de hejmara çaran a jêr e.

**b-** Her Heştpar ( ♪ ) yeksan e bi arasteyeke livê, li gorî ciyê xwe yan jî beranberî ciyekî weke yê xwe.

**c-** Her Şazdeparek ( 𝅘𝅥𝅯 ) yeksan dibe bi arasteyekê, ger Heştpar bi liveke temam yeksan bû. Wate du arasteyan di wan kêşên ku hejmara wan a jêrîn 16 ye.

**d-** Her Çarparek ( ♩ ) yeksan e bi arasteyekê, liv û Dupar ( 𝅗𝅥 ) dibe liveke temam, di wan kêşan de ku hejmarên wan ên jêrîn 2 be.

**e-** Her Duparek yeksan e bi arasteyekê, liv û Yekpar ( 𝅝 ) dibe liveke temam di wan kêşan de ku hejmara wana jêrîn 1 be.

Institut kurde de Paris

**Xwendina Noteyên Muzîkê:**

Xwendina Rîtmîk: Ji xwendina awazê ya bêyî strandin û jenînê (lêxistin) pêk tê. Wate, xwendina hemû noteyan li ser tebeqeyekê (qorekê).

Ji bo xwendineke sererast, divê ev xalên jêr li ber çavan bêne girtin:

**a-** Zanîna şêweya nîşaneyên demî û zanîna nirxa demî ya her şêwe û xwendina rîtima wan.

**b-** Nasîna dengên muzîkê û ciyê wan li ser pêlekana muzîkê; li gorî wê kilîla ku ji bo wê hatiye danîn.


**c-** Diyarkirina yekeya demî ya destpêka awazê; li gorî wê kêşa ku ji bo wê hatiye danîn.

**d-** Rêk-karîkirina yekeya demî, vêca nirxa wê çend be di liveke rêkkarîkirina demî de (hereket zebt elzeman) her yekeyeke demî, li gor hejmara jêrîn a rêbera kêşê, pêdivî bi liveke temam heye.

**1-** Xwendina Rîtma Nîşaneya Yekpar'ê 𝅝 :

Dema wê bi livê (hereketê) tê sazkirin.

**Mînak:**





Xwendina nîşaneyê li gorî dem û hejmarên 1,2,3,4 xuya dike ku her nîşaneyek hejmarên demê ne; her hejmarek yeksan e bi yek dem û ji bo rêkkarîkirinê pêdivî bi liveke temam heye.

**2-** Xwendina Rîtma Nîşaneya Dupar'ê 𝅗𝅥 :

Dema wê bi livê (hereketê) tê rêkxistin.


**Mînak:**




Institut Kurde de Paris

3- Xwendina Rîtma Nîşaneya Çarpar'ê:
Dema wê bi livê tê rêkxistin.


**Mînak:**




Çarpar yeksan e bi 1'ê demê, wate gava rêk-karîkirina demê, pêdivî bi liveke temam heye.

4- Xwendina Rîtma Nîşaneya Heştpar'ê:
Dema wê bi livê tê rêkxistin.

**Mînak:**



Heştpar yeksan e bi ½'ê demê, wate pêdivî bi nîv liva temam heye. Wate arasteyek di dema rêkkarîkirina dema wê de.

Nirxa demî ya vê şêweyê demek e, her wiha nirxa demî ya vê şêweyê jî demek e. Di vir de bi şêweya , em dest bi guhartina Heştpara duyem bi bêhnvedanê ku yeksan e bi dema xwe, dikin. Wate, di vir de arasteya duyem di liva temam de bêdeng e.

**Mînak:**




Institut kurde de Paris

**Xwendina vê şêweyê** ♪ ♩ ♪ : Di xwendina wê de dema wê bi liva rêkkariya demî tê rêkxistin ku ji Heştpar- Çarpar-Heştparê pêk tê.

**Mînak:**



**Xwendina vê şêweyê** ♩. ♪ : Ji Çarpar (+) ew xala ku di pey de tê pêk tê, ku bi nîv dema xwe re yeksan e. + Heştpar koya giştî (tevahiyê) dike du lêdan û bi vê şêweya xwarê bi livê tê rêkxistin.



**Mînak:**



**Xwendina vê şêweyê** : Ji du Şazdepar (+) Heştparek pêk tê, xwendina rîtma wê bi yek dema temam re yeksan e û pêdivî bi liveke temam heye, bi wî awayî dema wê tê rêkxistin.

**Mînak:**



Institut kurde de Paris

Xwendina vê  şêweyê, koya giştî (tevahiyê) dike demeke temam û pêdivî bi liveke temam heye, di dema xwendinê de bi vî awayî dema wê bi livê tê rêkxistin.

**Mînak:**



Xwendina vê  şêweyê ji çar Şazdeparan pêk tê, tevahiya hemûyan dike demeke temam û pêdivî bi yek liveke temam  heye.

**Mînak:**



Xwendina şêweya , yeksan e bi dema Çarparê

**Mînak:**



Institut kurde de Paris


Şêweya . bi vî awayî tê nivîsandin:

Yeksan e bi sê demê temam ku pêdivî bi sê livên temam heye.


**Mînak:**




Ji şêweya 'ê re dibêjin Sêyîne/Sêko (Tryole), koya giştî bi Çarparekê re yeksan e.




**Mînak:**



Şêweya 'ê bi awayê rîtma 'ê tê xwendin.

**Mînak:**



Institut kurde de Paris

Xwendina şêweya  şeşane yeksan e bi yek dema temam. Wate, Çarparek her sê

Şazdepar  bi yek arastê re yeksan e.

**Mînak:**



Institut kurde de Paris

## TEBEQEYÊN DENGÎ (QORÊN DENGÎ)

Ji bo destnîşankirina tebeqeyên dengî yên rastîn, stranbêj û jenyar (sazbend) amûrên weke korg, pîyano yan jî amûrên kokbexş (akorbexş) hildibijêrin.



Amûra Kokbexş / Ên Têne Eyarkirin

**Amûra kokbexş:** Amûreke metal e; du desteyên terîbî hene ku dişibe stiriyan. John Shore jenyarê ( el lut) bi eslê xwe Îngiliz di sala 1711'ê de ew çêkiriye û navê wê yê bi înglîzî "tuning fork" e. Dema ku madeyeke req li desteyên wê bikeve dengê La'ya navîn derdixe. Wate, dengê La'yê di nav valahiya duyem a pêlekanê de dibe weke kilîla sol.


Di derbarê wê lerizîna ku di dema lêxistina amûra kokbexş de derdikevin, her wiha ji bo cîgirkirina hejmara lerizînên wan dengên muzîkî, di sala 1953'an de li Londrayê kongreyeke navneteweyî hate lidarxistin ku 10 welat tevlê bûn. Di vê kongreyê de rêkeftinek li ser hejmara lerizîna dengê "La"yê hate çêkirin ku di çirkeyekê de 440 lerizîn be.

Bi wî awayî hemû muzîkjenên cîhanê, hînî kokkirina amûrên cuda cuda li ser wê kokê bûn, ku bi berdewamî dengê La'yê dide ku dikeve navenda amûra piyanoyê.

Institut kurde de Paris

## HÎNKER

### Hînkera 1'ê :




### Hînkera 2'an:




### Hînkera 3'yan:





### Hînkera 4'an :





Institut kurde de Paris

**Hînkera 5'an:**




**Hînkera 6'an:**



**Hînkera 7'an:**



**Hînkera 8'an:**




Institut kurde de Paris

**Hînkera 9'an:**



**Hînkera 10'an:**




**Hînkera 11'an:**




Institut kurde de Paris

Hînkera 12'an:



Hînker 13'an:




Hînkera 14'an:



Institut kurde de Paris

**Hînkera 15'an:**



**Hînkera 16'an:**




**Hînkera 17'an:**




Institut kurde de Paris

**Hînkera 18'an:**



**Hînkera 19'an:**



**Hînkera 20'î:**




Institut Kurde de Paris

**Rêya Bazineya Pêncî:** Di dengê pêncem ê peyjeya Do'ya mezin (macor) de, peyjeyeke nû dirust dibe; di peyjeyên din de jî bi vî awayî ye:

*Xişteya Peyjeya Mezin a Bilindok/Berzok Major #*

*Bazineya Pêncî*





Institut kurde de Paris

**Rêya Bazineya Çarîn:** Di dengê çarem ê peyjeya Do'ya mezin (macor) de, peyjeyeke nû dirust dibe; di peyjeyên din de bi vî awayî ye:

*Xişteya Peyjeya Mezin a Nizmok Major* ♭

*Bazineya Çarîn*





Institut kurde de Paris

**Rêya Bazineya Pênci:** Di dengê pêncem ê peyjeya La'ya biçûk (mînor) de, peyjeyeke nû dirust dibe; di peyjeyên din jî bi vî awayî ye:

*Xişteya Peyjeya Biçûk a Berzok Major #*

*Bazineya Pênci*





Institut Kurde de Paris

**Rêya Bazineya Çarîn:** Di dengê çarem ê peyjeya La'ya biçûk (mînor) de, peyjeyeke nû dirust dibe; di peyjeyên din de jî bi vî awayî ye:

*Xişteya Peyjeya Biçûk a Nizmok Minor* ♭

*Bazineya Çarîn*




Institut kurde de Paris

**Têbînî:** Her peyjeyeke mêcer, peyjeyeke mayner heye; rêberê wan ê peyjeyan yek e. Bi nizimkirina dengê yekem ê her peyjeyeke mêcer, ton û nîvek peyjeya mayner bi dest dikeve.

**Beşa Diyêzan:**

Peyjeyên Mêcer

sol rê la mî sî fa# do#



mî sî fa# do# sol# rê# la#

Peyjeyên Mayner

**Beşa Bîmolan:**

Peyjeyên Mêcer

fa sî♭ mî♭ la♭ rê♭ sol♭ do♭




rê sol do fa sî mî♭ la♭

Peyjeyên Mayner

**Navber di Muzîka Rojhilatî de**


Navbera Biçûk





Navbera Mamnavendî




Navbera Mezin




Navbera Fire





**Têbînî:** Hejmar, nîşaneya wan çarîkên dengî ên cudakar in ku ketine navbera du dengên pileya muzîkê.

Institut Kurde de Paris


INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

## Koma Meqamê 'Ecem





Institut Kurde de Paris

## Koma Meqamê Beyat




Institut kurde de Paris

## Koma Meqamê Hîcaz




Institut Kurde de Paris

## Koma Meqamê Kurdî

Meqama Kurd




Meqama Kurd Hicaz





Meqama Kurd Ecema Fire




Meqama Kurd Şurî




Meqama Kurd Rast




Meqama Kurd Beyat




Institut kurde de Paris

## Koma Meqamê Nehawendî

Meqama Nehawend Hîcaz




Meqama Nehawend

Meqama Nehawend Kurd




Meqama Nehawendî Kurdî

Meqama Cot Nehawend




Meqama Nehawendî Mezin

Meqama Nehawend Şurî




Meqama Nehawendî Xemilandî

Meqama Nehawend Beyatî





Meqama 'Uşaqî Misrî

Meqama Nehawend 'Ecem





Meqama Şewqa Nur

## Koma Meqamê Rast




Institut kurde de Paris

## Koma Meqamê Sêgah




Institut kurde de Paris

Institut Kurde de Paris

# SIRÛD Û STRAN

Institut kurde de Paris

## Ey Reqîb




**Ey Reqîb**

Ey reqîb her mawe qewmî Kurdziban,
Nayşkênî daneyî topî zeman.

Kes nelê Kurd mirdûwe Kurd zîndûwe,
Zîndûwe qet nanewê alakeman.

Qewmî Kurd hestaye serpê wek dilêr,
Ta be xwên nexşî bika tacî jiyan.

Kes nelê Kurd mirdûwe Kurd zîndûwe,
Zîndûwe qet nanewê alakeman.

Ême roley Mîdya û Keyxusrewîn,
Dînman e ayînman e nîştiman.

Kes nelê Kurd mirdûwe Kurd zîndûwe,
Zîndûwe qet nanewê alakeman.

Lawî Kurd hazir û amade ye,
Giyan fîda ye giyan fîda ye giyan fîdan.

Kes nelê Kurd mirdûwe Kurd zîndûwe,
Zîndûwe qet nanewê alakeman.

Institut kurde de Paris

**Ey Reqîb (Kurmancî)**

Ey reqîb her maye qewmê Kurdziman,
Naşikê û danayê bi topê zeman.

Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin,
Jîn dibe, qet nakeve ala Kurdan.

Em xortên rengê sor û şoreş in,
Seyr bike xwîna tiya me da rijand.

Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin,
Jîn dibe, qet nakeve ala Kurdan.

Em xortên Medya û Keyxusrew in,
Dîn îman û ayînman, her niştiman,
Dîn îman û ayînman, Kurd û Kurdistan.

Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin,
Jîn dibe, qet nakeve ala Kurdan.

Lawê Kurd rabûye ser pê, wek şêran,
Ta bi xwîn nexşîn bike tacê jiyan.

Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin,
Jîn dibe, qet nakeve ala Kurdan.

Xortên nû tev hazir û amade ne,
Can fîda ne can fîda, her can fîda!

**Ey Reqîb (Dimilkî)**

Ey reqip her mendo qewmê Kirdzon,
Nesikêno û nîno war bi topê zeman.

Kes(Zo) mevaze Kurd mireno Kird jiyeno,
Jiyena qet nêkona (nina war) ala Kirdan.

Ma xorte Medya û Keyhusrevîyo
Dîn îman û ayîman her nistîman (Dînê ma îmanê ma her Nistîman),
Dîn iman û ayiman Kird û Kurdistan (Dînê ma îmanê ma Kird û Kurdistan).

Kes (Zo) mevaze Kurd mireno Kurd jiyeno,
Jiyena qet nêkona ala Kurdan.

Lazê Kird wistowe zey seran,
Ta bi guni nexs bikero tacê cîhan.

Institut kurde de Paris

## Em Rêwî ne

**Sirûd: Zarokên Kurdan**
**Meqamê Rast (sol)**

**Helbest: Dildarê Aştî**
**Awaz û notenivîs: Kamîran Îbrahîm**




### Em Rêwî ne

Em rêwî ne em rêwî ne em kevokên aştî ne,
Me daye ser rêka jînê azadî bo me evîn e.

Em piçûkên dilbikovan gazî dikin xelkên cîhan,
Agir û cengê naxwazin her biratî bo mirovan.

Me divê şîrîn dibistan lîstik û seyran û dîlan,
Em kulîlkên biharê ne me divê bax û gulîstan.

Institut kurde de Paris

## Xwaye Weten Awa Key

**Meqamê 'Ecem (do)** **Helbest: Fayeq Bêkes**




### Xwaye Weten Awa Key

Xwaye weten awa key çend dillgîr û şîrîn e,
Deştî xoş û rengîn e awî kewser e xakî gewher e,
Pir le gull û nesrîn e.

Seyrangey beharan î sewze giyay nerm û ciwan î,
Sed dill ebê heyranî awî kewser e xakî gewher e,
Pir le gull û nesrîn e.

Şaxî befrîn û berz e bo rabûrdûman remz e,
Çîmenî ciwan û sewz e awî kewser e xakî gewher e,
Pir le gull û nesrîn e.

Em şwêne şwênî Kurd e cêyî qareman û merd e,
Laney şêrî neberde awî kewser e xakî gewher e,
Pir le gull û nesrîn e.

Weten çawî lêmane derîkeyn le tengane,
Heyfe bête wêrane awî kewser e xakî gewher e,
Pir le gull û nesrîn e.

Institut kurde de Paris

## Row Row




**Row Row**

Row rowo row your boat
Gen tly down the stream
Merrily merrily merrily
Life is but a dream.

Institut kurde de Paris

**Hemû Salêk Be Xoşî**

Awaz : Cîhanî
Note Nûs : Kamîran Îbrahîm




**Hemû salêk be xoşî**
سنة حلوة يا جميل
**to you birthday Happy**
**هەموو ساڵێك بەخۆشی**

**Hemû salêk be xoşî**
سنة حلوة يا جميل
**Happy birthday to you**
**هەموو ساڵێك بەخۆشی**

**Hemû salêk be xoşî**
سنة حلوة ياجميل
**Happy birthday to you**
**هەموو ساڵێك بە خۆشی**

Institut kurde de Paris

# Hemîşe Xwêndin

Awaz : Sirûd Fû'ad
Honrawe : Sarêj Ziyad




Institut kurde de Paris

# Katyûşa

Folklora Rûsî

Notenûs: Kamîran Îbrahîm




Les mots de M.Isakovskogo
La musique de M.Blantera

« Katioucha»

S'épanouissaient les pommiers et les poires,
Ont flotté les brouillards au-dessus de la rivière.
Il y avait pour le bord une Katioucha,
Pour un haut bord, sur rapide

Sortait, la chanson engager une conversation
Sur l'aigle de steppe bleu,
Sur celui-la, qui aimait,
Sur celui-la, quelles lettres ménageait

Oi, toi, la chanson, la chansonnette de jeune fille,
Toi vole pour clair par le soleil après
Et le combattant sur lointain de frontière
De la Katioucha remets salut

Qu'il se rappelle la jeune fille simple,
Qu'entendra, comment elle chante,
Qu'il ménage la terre natal,
Mais la Katioucha épargnera l'amour

Sé'panouissaient les pommiers et les poires,
Ont flotté les brouillards au-dessus de la rivière
Il y avait pour le bord une Katioucha,
Pour un haut bord, sur rapide

Слова М. Исаковского
Музыка М.Блантера

«Катюша»

Расцветали яблони и груши,
Поплыли туманы над рекой.
Выходила на берег Катюша,
На высокий берег, на крутой.

Выходила, песню заводила
Про степного сизого орла,
Про того, которого любила,
Про того, чьи письма берегла.

Ой, ты, песня, песенка девичья,
Ты лети за ясным солнцем вслед
И бойцу на дальнем пограничье
От Катюши передай привет.

Пусть он вспомнит девушку простую,
Пусть услышит, как она поет,
Пусть он землю бережет родную,
А любовь Катюша сбережет.

Расцветали яблони и груши,
Поплыли туманы над рекой.
Выходила на берег Катюша,
На высокий берег, на крутой.

Institut kurde de Paris

## Bagiyê

Meqamê Kurdî (la)

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm

Folklora Asuriyan




### Bagiyê

Bagiyê hay Bagiyê lo lo lo hay Bagiyê,
Bagiyê hay Bagiyê rewşê lewendiyê,
Bagiyê j' malêt mîra rewşê lewendiyê,
Pez berdan çûn silava lê lê lê lêy Bagiyê,
Zad xwarin digel bêriya rewşê lewendiyê,
Bagiyê j' malêt w'axa lê lê lê hay Bagiyê,
Pez berdan çûn silava rewşê lewendiyê,
Bagiyê neçe dara lo lo lo hay Bagiyê,
Bagiyê neçe dara rewşê lewendiyê,
Werîs dê l' te bin mar e lo lo lo hay Bagiyê,
Werîs dê l' te bin mar e rewşê lewendiyê,
Bagiyê neçe pwîşî lê lê lê hay Bagiyê,
Bagiyê neçe pwîşî rewşê lewendiyê,
Dê êne te Etriwîşî la la la lay Bagiyê,
Dê êne te Etriwîşî rewşê lewendiyê,
Dê j' te veken armûşî lê lê lê lêy Bagiyê,
Dê j' te veken armûşî rewşê lewendiyê,
Bagiyê hay Bagiyê lê lê lê lêy Bagiyê,
Bagiyê hay Bagiyê rewşê lewendiyê.

Institut kurde de Paris

## Ey Newroz

Awaz û Helbest: Se'îd Yûsiv

Note: Kamîran Îbrahîm




### Ey Newroz

Ey Newroz ey Newroz cejna Kurdên qehreman,
Her pîroz her pîroz tim li Kurd û Kurdistan,
Hildin jor û jor û jor ala rengî bê hildan,
Natewê nakevê naşikê namirê milletê Kurd namirê.

Te rêka xebata ewil bi milletê Kurd dabû nas,
Zor birînê`m kiribûn kêmketî bê mefir û xwas,
Ew Kawayê dînemêr hat millet jê kir xelas,
Natewê nakevê naşikê namirê milletê Kurd namirê.

Îro ew bayê hînik van çîçekan dihejînê,
Li her ciyî seyran e û teyr ji kêfa dixwînê,
Newroz Kurdo li te pîroz çi xweştir ji vê mizgînê,
Natewê nakevê naşikê namirê milletê Kurd namirê.

Ber' millet tev zanibin Kurd xebatê nadê bi xewê,
Her egîd e û şiyar e li ber dijmin ti car natewê,
Serfiraz e li her ciyî li Kurdistan û li vir û li wê,
Natewê nakevê naşikê namirê milletê Kurd namirê.

Institut kurde de Paris

## Were Qurban

Hesen Zîrek




### Were Qurban

Zulfî wek marî reş e,
Be ciwanî xot bimbexşe,
Eger bebarî zehmet nebê,
Bom were derkî hewşe.

Were qurban aramî dillan,
Şêtit kirdim were qurban,
Eqlit birdim hoşit birdim,
Sotam birjam were qurban.

Zulfî dû mîtr û nîw e,
Yarim befr e û barîwe,
Min le diwênê we nemdîwe,
Ew pêm dellê hetîw e.

Awrî le dillim berdawe,
Wek sûre gullî xemlîwe,
Le ber perçemî ciwan e,
Lêwî mislî qeytan e.

Naxoşî kirdûm hawar,
Pêm billên le kwê mîwan e,
Zulfî her wek xeyat e,
Em kiçe cêgey awat e.

Eger maçêkim bidatê,
Bo min rêgeyî necat e,
Were qurban aramî dillan,
Şêtit kirdim were qurban.


Institut kurde de Paris

## Ay Lê Gulê

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm

Awaz: Mihemmed Şêxo

Helbest: 'Emerê Lalê




### Ay Lê Gulê

Ay lê gulê gula minê şêrina l' ber dilê minê,
Gulê nadim bi malê dinê we l' ser gulê têm kuştinê.

Gulê kesk û sor û zer e nîşana alê l' ser e,
Êdî sipî'w gewher e şêrîn û peymana minê.

Rengê te'y pir delalî bilbil li ser te dinalî,
Te nebînim bi vî halî amanc û kedera minê.

Zordar dibê ez gul nadim ezê zend û benda badim,
Ezê gilh û sera radim azad dibê b' şorşa minê.

Bi xwedê ez pismamê te me bê sûnd û pesindarê te me,
Ser ceng û hewarê te me qelenê te j' xwîna minê.

Institut kurde de Paris

## Kurdistan Yan Neman

Meqemê Rast (do) Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




**Kurdistan Yan Neman**

Kurdistan yan neman em Kurd li ser ya xwe man,
Bo Kurdistana rengîn em tev jê re bi qurban.

Natirsin ji top û ber em sînga xwe didin ber,
Roja go em bikin şer weke em bikin dîlan.

Lo Kurdo bik' xebat va îro roja me hat,
Em bostek 'erda welat nadin bi malê cîhan.

Em ev Kurdê dînemêr d'meydanê de bûne şêr,
Bo 'erda mey zîv û zêr em dikin şerê giran.

Pêş de diçin naçin paş me dijmin tev kir kelaş,
B'yekîtiya Kurdê baş bi şêwr û raya merdan.

Institut kurde de Paris

## Ez Xelef im

Meqam: Beyata Rê




### Ez Xelef im

Ez Xelef im Xelef im hawar e mîr hawar e mîr,
Ez Xelef im Xelef im Êzdînşêr hakimê Botan e,
Xweyê şûrê bi sedef im hawar e mîr hawar e mîr,
Xweyê şûrê bi sedef im Êzdînşêr hakimê Botan e.

Ez Xelefê dirêj im hawar e mîr hawar e mîr,
Ez Xelefê dirêj im Êzdînşêr hakimê Botan e,
Xweyê şûrê qirêj im hawar e mîr hawar e mîr,
Xweyê şûrê qirêj im Êzdînşêr hakimê Botan e.

Gel eşîra xwe dibêjim hawar e mîr hawar e mîr,
Gel eşîra xwe dibêjim Êzdînşêr hakimê Botan e,
Gel eşîra xwe dibêjim hawar e mîr hawar e mîr,
Gel eşîra xwe dibêjim Êzdînşêr hakimê Botan e.

Ez Xelefê kinik im hawar e mîr hawar e mîr,
Ez Xelefê kinik im Êzdînşêr hakimê Botan e,
Xweyê şûrê bi şirik im hawar e mîr hawar e mîr,
Xweyê şûrê bi şirik im Êzdînşêr hakimê Botan e.

Gel eşîra xwe dikim hawar e mîr hawar e,
Gel eşîra xwe dikim Êzdînşêr hakimê Botan e,
Gel eşîra xwe dikim hawar e mîr hawar e,
Gel eşîra xwe dikim Êzdînşêr hakimê Botan e.

Hewrexê xweş Hewrexê hawar e mîr hawar e mîr,
Hewrexê xweş Hewrexê Êzdînşêr hakimê Botan e,
Hewrexê xweş Hewrexê hawar e mîr hawar e mîr,
Hewrexê xweş Hewrexê Êzdînşêr hakimê Botan e.

Xweş şer e ser Şernexê hawar e mîr hawar e mîr,
Xweş şer e ser Şernexê Êzdînşêr hakimê Botan e,
Topa mezin ket rexê hawar e mîr hawar e mîr,
Topa mezin ket rexê Êzdînşêr hakimê Botan e.

Institut kurde de Paris

## Xwe Neveşêre

Meqamê Rast (fa)

Awaz û helbest: Se'îd Yûsif

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




### Xwe Neveşêre

Xwe neveşêre kubar serrûkê hilîne,  
Tu pir delal î canê rûyê te zêrîn e,  
Tu rûqurmiz î wek sêvê Xelatê,  
Tu xeberşeker î lêvê te hingvîn e.

Ro li min bûne sal bo te şêrîn yarê,  
Dil dikê nalenal derman bik' kubarê,  
Zerya çavxezal tu bûyî bûka tarê.

Çavê min bûne newal tu bes mi bigrîne,  
Ez ne xerîb im kubar xortekî gundî me,  
Ez evîndar im bawer ke ez ne xwînî me,  
Çavê'm qurmîn ji te bi hêvî me.  
Birînê'm gelek kûr in tu wer bikewîne.


Institut kurde de Paris

## Ba Biçîne Serweys

Meqamê Beyat (rê)

Awaz: Folklor

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




### Ba Biçîne Serweys

Ba biçîne Serweys bo tobekarî
Tobe le gişt şit bikeyn ey hawar xeyre dildarî
Giyan giyan û giyan giyan giyan azîzekem
Nîweşew raburd ey hawar întîzarekem
Giyan giyan û giyan giyan giyan azîzmî
Min kesim niye ey hawar to gişt kesmî.

Institut Kurde de Paris

## Wa Xortê Serbaz

Meqamê Rast (do)

Awaz û helbest: Se'îd Yûsif

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




### Wa Xortê Serbaz

Wa xortê serbaz kalê serfiraz,
Keçên gerdengaz kêçên gerdengaz,
Newroza me hat tev bikin dîlan.
Ban kin b' lîlandin sirûda b'xwendin,
Dengê xwe hildin dengê xwe hildin,
Bê bijî welat wa bûka cîhan.
Bikin terp û toz bo cejna Newroz,
L'hev bikin pîroz l'hev bikin pîroz,
Li Kurda xebat l'dijmin her nema.
D'em çêkin agir her sal li vir û wir,
Cejna Kurdê nemir cejna Kurdê nemir,
Li hev bikin xelat pîroz be l'Kurdistan.

Institut kurde de Paris

## Dû Mih in Dû Bizin in

Meqamê Beyat (sol)

Folklor: Devera Behdînan

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




### Dû Mih in Dû Bizin in

Dû mih in dû bizin in here lê herê lo,
Dû mih in dû bizin in heyrano milano.
Li govê nasekinin here lê herê lo,
Ew bela serê min in here lê herê lo,
Ew bela serê min in heyrano milano.
Sêng doşek e l' ser balgiha here lê herê lo,
Sêng doşek e l' ser balgiha heyrano milano.
Bî firfira van çîçika here lê lê herê lo,
Bî firfira van çîçika heyrano milano,
Firîn deynan li ser texça here lê lê herê lo.
Hopilerî çi hopilerî here lê lê herê lo,
Hopilerî çi hopilerî heyrano milano,
Tanca te tanca serî here lê lê herê lo,
Tanca te tanca serî heyrano milano.
Ji Hevlêrê heta Wanê here lê lê herê lo,
Ji Hevlêrê heta Wanê heyrano milano,
Dilê min derya xema here lê lê herê lo,
Dilê min derya xema heyrano milano.

Institut kurde de Paris

## Westiyame

Meqamê Beyatê Şurî

Awaz: Kamiran Îbrahîm

Helbest: Dildarê Aştî




### Westiyame

Westiyame ji hatin û ji çûnê,
Hez te dikim gelek gelek xatûnê,
Derî li min veke li nik min rûnê,
Hilêve vê şerm û vê payebûnê.
Va dilê min bûye miştaxa derdan,
Çivîkên canê'm hêlînê xwe berdan,
Gelek min dêşînin sawîr û goman,
Baxên evînê jar mane bê avdan.
Erê hey Zîna min Mem birîndar e,
Mizgîn ji asoyan nabin diyar e,
De were dilberê va ye şev qer e,
Evîndarê te şêt û bendewar e.

Institut Kurde de Paris

## Zara Giyan

Meqamê Beyat (rê)

Awaz: Folklor

Notenivîs: Kamîran Îbrahîm




### Zara Giyan

Serim sergerdan pêm be kotewe, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Ba destim bibrin be lîmotewe, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Hate xwar dête xwar, bew lence'w lare, Subh û êware dîdem Zara.

Her kêwî ebînî temî le bine, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Ewe tem niye henasey mine, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Hate xwar dête xwar, bew lence'w lare, Subh û êware dîdem Zara.

Bes bê û bes biço bes dilniyam ke,Wey wey Zara giyan dîdem Zara,
Bes be lence'w lar şêt û şeydam ke,Wey wey Zara giyan dîdem Zara,
Hate xwar dête xwar, bew lence'w lare, Subh û êware dîdem Zara.

Şerte lem dunya toyan eda pêm, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Çiş ba lew dunya dozex biwaye cêm, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Hate xwar dête xwar, bew lence'w lare, Subh û êware dîdem Zara.

Şertim kirdewe taku bimênim, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Le ser rûyî zewî her to bihênim, Ey wey Zara giyan dîdem Zara,
Hate xwar dête xwar, bew lence'w lare, Subh û êware dîdem Zara.

Institut kurde de Paris

# ÇEND PARÇE MUZÎK

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## Kew Yar

Bi Dengê Mihemedî Mamlê

Bi Notekirina Kamîran Îbrahîm




Institut kurde de Paris

## (Nesim 'Elîna Elhewiya) نسم علينا الهوى

Bi Dengê Feyrûz

Bi Notekirina Kamîran îbrahîm




Institut kurde de Paris

## And Ihe Sen

Zanîngeha Selahaddînê Fakulteya Hunerên Ciwan Beşa Muzîkê

Amadekirin: Celal Wendî



Institut kurde de Paris

## (Benit El Şelbîyet) بنت الشلبية

Awaz û Helbest: Rêhbanî

Bi Dengê Feyrûz

Bi Notekirina Dr. M. 'Ezîz Zaza




Institut kurde de Paris

## Longa Ferehfeza

George Micheal, Delîl Selalîmi, Birada Şengê, Salîm Husên, Daralşon – El Şeqatîye Helema Bexdar, 1986




Institut kurde de Paris

## (Musîqî Meqam El Xenbat) موسيق مقام عاخنبات

Zanîngeha Selahaddin Fakulteya Hunerên Ciwan Beşa Muzîkê, Amadekirin: Mihemmed Salîh Şilî




Institut kurde de Paris

## El Reqse El Ermeniye (الرقصة الارمنية)



Institut Kurde de Paris

# Sulaf



Institut kurde de Paris

## Longa Yorgo




Institut kurde de Paris

# Longa Hicazkar Kurd




Institut kurde de Paris

## Longa Adhem




Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

## Korpekanî Helabca

Muzîk û Berhevkar: Amanc Xazî




Institut kurde de Paris

## Ey Reqîb

Amadekirin: Çeto Newroz




Institut Kurde de Paris

## Şehîd

Berhevkar: Çeto Newroz




Institut Kurde de Paris

**(Sema'i Beyat Qedim)** سماعي بيات قديم




Institut kurde de Paris

## (Sema'i Beyat) سماعي بيات




Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

**Xişteya Ravekirina Hinek Têgehên Cihanî**

| Jimare | Kurdî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| 1 | Bi qasî pêwîst e | Apiacere |
| 2 | Heta karî bi lez (Heta bêjî bi lez) | Accelerato |
| 3 | Hêza Dupatkirinê | Accentuato |
| 4 | Bi azadî (Bi serbestî) | Ad libitum |
| 5 | Hinekî bi bêhna fireh | Adagietto |
| 6 | Bi bêhna fireh | Adagio |
| 7 | Bi xemgînî | Ad dolorato |
| 8 | Bi dilşewatî (Bi dilsozî- Bi dilsojî) | Affetuoso |
| 9 | Livdar (Livgîn – bi hereket) | Agitato |
| 10 | Bi merşkanî (Bi awayê merşê -Merşane) | Alla Marcia |
| 11 | Bi dostane | Amabile |
| 12 | Bi hezkirinê ve ( Bi xoşdivî – Bi xoşewîstî) | Amoroso |
| 13 | Noteya "La" | A |
| 14 | Berebere ber bi lezandinê (Pilepile ber bi lezandinê) | Accelerando (accl.) |
| 15 | Zext (Guşar) | Accent |
| 16 | Bi dilgermî û dilxweşî | Agitato |
| 17 | Belawela | Allargando (allarg) |
| 18 | Heta radeyekê bi lez (Heta radeyekê zûka) | Allegretto |
| 19 | Lezî (Lezayî – Lezahî) | Allegro |
| 20 | Bi lez û bi çalakî | Allegro animato |
| 21 | Heta karî bi lez | Allegro assai |
| 22 | Alto | Alto |
| 23 | Kilîta Alto (Kilîla Alto) | Alto Clef |
| 24 | Rûberge | Amplitude |
| 25 | Bi nermî (Hêdîka) | Andante |
| 26 | Bi zindî | Animato |
| 27 | Bi wê leza ku sazbend pê xweş e | Apiacere |

| Jimare | Kurdî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| 28 | Bi germ û gurî | Appasionata |
| 29 | Appoggiatura | Appoggiatura |
| 30 | Bi kevan | Arco |
| 31 | Arpeggio | Arpeggio |
| 32 | Hilketin | Ascending |
| 33 | Heta karî (Heta ji te bê) | Assai |
| 34 | Rastok | Auflosungszeichen |
| 35 | Fire (Pir – Zor) | Augmented |
| 36 | Yekser here beşa bê (Di parçeyê muzîkê de) | Attacca |
| 37 | Bi şêweyekî baş | Bene |
| 38 | Bi biriqî ( Bi kel û çoş- Bi çoş û xiroş) | Brillante |
| 39 | Noteya "Sî | B |
| 40 | Xane | Bar |
| 41 | Xeta xaneyan | Bar line |
| 42 | Bass | Bass |
| 43 | 'Do' ya bass | Bass C |
| 44 | Kilîla bass yan kilîla "Fa" | Bass clef |
| 45 | Nizmok | Be(b) |
| 46 | Lêdan | Beat |
| 47 | Rastok | Beccare |
| 48 | Nizmok | Bemolle |
| 49 | Baş | Ben |
| 50 | Başebaş diyarkirin (Başebaş xuyakirin) | Ben morccato |
| 51 | Kevana Zeliqandinê (Nûsandinê) | Bind or tie |
| 52 | Rastok | Bequadro |
| 53 | Pêlekana bass | Bass stave |
| 54 | Bassoon | Bassoon |
| 55 | Dubareya bilez | Biss (lat.) |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 56 | Cotenizmok | Boppe-be (bb) |
| 57 | Breve or | Breve or |
| 58 | Bêhnvedana Breve | Breve rest |
| 59 | Ji dil û can,  bi Zindî, bi kel û çoş | Biro |
| 60 | Bi darê kevanê | Coll legno |
| 61 | Bi giyan ( Ji dil û can – Bi dil û can) | Con legno |
| 62 | Bi germî | Con calore |
| 63 | Bi strankî (Bi strankanî) | Cantabile |
| 64 | Bi azar (Bi êş û jan) | Con doloer |
| 65 | Çalak | Con energia |
| 66 | Bihêz | Con forza |
| 67 | Bi agir (Bi kela rabûyî – Bi kelekel) | Con fuoco |
| 68 | Livdar (Livgîn) | Con moto |
| 69 | Noteya "Do" | C |
| 70 | Xavtir û bêhnfirehtir (Hêdîtir û bêhnfirehtir) | Calando |
| 71 | Bi lez û bez ( Acele) | Calcando |
| 72 | Kilîta "Do" | C Clef |
| 73 | Bi lezî (Surat) | Celero |
| 74 | Çello | Cello |
| 75 | Akord | Chord |
| 76 | Rengîn | Chromatic |
| 77 | Peyjeya rengîn | Chromatik scale |
| 78 | Klarnet | Clarinet |
| 79 | Kilît | Clef |
| 80 | Bi | Col |
| 81 | Bi kevan | Col arco |
| 82 | Daner (danîyar) | Composer |
| 83 | Dengewar | Compass |
| 84 | Navbera Hevdûdanî (Navbera Hevbend) | Compound interval |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 85 | Kêşa hevdûdanî (Kêşa Pevgihayî-KêşaHevbend) | Compound time |
| 86 | Bi | Con |
| 87 | Bi Ronakî | Con brio |
| 88 | Kok (Lihev – Levhatî - hevsaz) | Concord |
| 89 | Bi hêzê ve | Conforza |
| 90 | Bi germî, bi agir (Ji dil û can, bi kel û çoşê) | Confuco |
| 91 | Bi bexş | Congrazia |
| 92 | Herekata girêdayî (Liva girêdayî) | Conjunct movement |
| 93 | Bi liv û lebatê (Bi hereket) | Con moto |
| 94 | Bi pedal (Tev pedal) | Con pedale |
| 95 | Bi sade û sakarî | Con vivacitc |
| 96 | Derketina berebere ya asta deng | Crescendo |
| 97 | Çarpar | Crotchet |
| 98 | Bêhnvedana Çarpar (Bêhnvedana Çarpar) | Crotchet rest |
| 99 | Notaya şkestî | Crushed note |
| 100 | Tirpegurgî | Cyncopation |
| 101 | Bi xurtî | Deciso |
| 102 | Ji bi hêzê ber bi hêmîniyê ve | Decrescendo |
| 103 | Bi xemgînî | Dolente dolorsa |
| 104 | Noteya "Re" | D |
| 105 | Ji | Da,dal |
| 106 | Dubare ji serî ve | Da capo |
| 107 | Dubare ji nîşaneyê ve | Dal segno |
| 108 | Muzîka semayî | Dance music |
| 109 | Berebere danîna asta deng | Decrescendo(dcres) |
| 110 | Sîûdupar | Demiseemiguaver |
| 111 | Bêhnvedana Sîûdupar | Demiseemiguaver rest |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | İngilîzî |
|---|---|---|
| 112 | Daketin | Descending |
| 113 | Çalak | Deso |
| 114 | Peyjeya rêkxraw (Peyjeya rêkxistî, Peyjeya hevsazkirî, Peyjeya têkûzkirî) | Diatonic scale |
| 115 | Navbera rêkûpêkî (Navbera Têkuzkirî) | Diatonic interval |
| 116 | Nîvpileya rêkûpêk | Diatonic semiyone |
| 117 | Bilindok (Bilindek-Berzok) | Diese(#) |
| 118 | Hêdî hêdî ji nav diçe. | Diluendo morendo |
| 119 | Kêm | diminished |
| 120 | Nakok (Nelihev – Nelihevhatî) | Discord |
| 121 | Hereketa qutkirî (Liva qutkirî) | Disjunct movement |
| 122 | Bi awayê parvekirî bo du beşan yan bêhtir | Divisi |
| 123 | Bi şêrînî, bi xoşewîstî (bi hezkirinê) | Dolce |
| 124 | Pir bi şêrînî | dolceissimo |
| 125 | Zal | Dominant |
| 126 | Cotenizmok | Doppiobmolle(bb) |
| 127 | Cotebilindok | Doppel;renz |
| 128 | Du caran li liva berê (Du caran ji liva berê bêhtir) | Doppin movimento |
| 129 | Cotexeta xaneyê | Double bar – line |
| 130 | Cotenizmok | Double-flat(bb) |
| 131 | Cotelonga (double longa) | double longa |
| 132 | Dupara xaldar | Dotted minim |
| 133 | Dupara duxalî | Double dotted minim |
| 134 | Cotenizmok | Duble bemol |
| 135 | Cotebilindok | Duple dieses |
| 136 | Duku | Duplet |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 137 | Kêşa dunî (demî) | Duple time |
| 138 | Peyjeya mezin | Dur |
| 139 | Muddet (duration) (Vekêşan, Pêveçûn, Têveçûne) | Duration |
| 140 | Bi derbirînê | Espressivo, Espressione |
| 141 | Noteya "Mî" | E |
| 142 | Dawî | End |
| 143 | Sîûdupar | |
| 144 | Kroş yan noteya 8'a temam | Eight-best |
| 145 | Bi karîn | Energico |
| 146 | Yên hevta (Yên wekhev) | Enharmoic, Equivalent |
| 147 | Bihêz | Forza(con) |
| 148 | Bihêrs | Furioso |
| 149 | Noteya "Fa" | F |
| 150 | Noteya "Fa" | Fa |
| 151 | Klîta "Fa" | F clef |
| 152 | Vewestan - (Wiçan) | Fermato(pause) |
| 153 | Dawî | Fine |
| 154 | Nizmok | Flat(b) |
| 155 | Form (senfoni, sonata) | Form |
| 156 | Tund (Xurt) | Forte |
| 157 | Gelek tund (Gelek xurt) | Fortissimo(ff. Or fff.) |
| 158 | Hêz | Froza |
| 159 | Bi hêzkirina deng ji nişke ve | Forzando |
| 160 | Yekpar | Four-beat |
| 161 | Frekans | Frequency |
| 162 | Noteya bingehîn | Fundamental |
| 163 | Germ, agir | Fuoco |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 164 | Bi xweşî | Giacoso |
| 165 | Guncaw | Giusto |
| 166 | Bi sîngxişkê, Bi xuşînê | Glissando |
| 167 | Bi dilniwazî | Grazioso |
| 168 | Bi mezinî | Grandioso |
| 169 | Bi çar gor – Bi çar milan (grave) | Grave |
| 170 | Bi çêj (Bi tam) | Gustoso |
| 171 | Noteya "Sol" | G |
| 172 | Kilîta "Sol" | G clef |
| 173 | Vewestana giştî (Vêsana Giştî) | General pause |
| 174 | Bi xweşî, bi hayjêbûnê | Giocoso |
| 175 | Bi xweşî, bi dilxwazî | Giojoso |
| 176 | Piyanoya mezin | Grand piano |
| 178 | Gelek hêdî | Grave |
| 179 | Bexşîn (Bi bexşînê) | Crazioso |
| 180 | Pêlekana mezin | Grest stave |
| 181 | Heştpar | Helf best |
| 182 | Dupar | Half note |
| 183 | Serê noteyê | Head of note |
| 184 | Şêstûçarpar | Hemidemisemiquaver |
| 185 | Bêhnvedana şêstûçarparê | Hemidemisemiquaver rest |
| 186 | Akora Netêkûz, Koka Nesererast / Ahenga (koka) netemam | Imperfect concord |
| 187 | Leztir û tundtir dibe. | Incalazando |
| 188 | Muzîka amûrî | Instrumental music |
| 189 | Ast | Interval |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| 190 | Navber (Miyane) | Interval |
| 191 | Çivdana Hilgeriyayî (Bi qelibandin) | Interted turn |
| 192 | Hevsazkirina noteyên nesazkar (Akorkirina noteyên nesazkar) | Irregular groupingof notes |
| 193 | Gelek (pir) | Issimo |
| 194 | Kilîtgeh | Keyboard |
| 195 | Bingeh | Keynote tonic |
| 196 | Rêbera peyjeyê | Key-signature |
| 197 | Bilindok | Kreuz(#)(ger.) |
| 198 | Bi hêsiran (Bi rondikan) | Lacrimoso |
| 199 | Hinekî dirêj û hinekî xav (hêdî-sist) | Larghetto |
| 200 | Dirêj û xav (sist-hêdî) | Largo |
| 201 | Girêdayî | Legato |
| 202 | Bi sivikî | Leggiero |
| 203 | Gelek xav (sist-hêdî) | Lento |
| 204 | Noteya “La” | La |
| 205 | Belawela (Bi belavî-jevbelav) | Largando |
| 206 | Heta radeyekê bi berfirehî (bi fireyî) | Larghetto |
| 207 | Gelek bi berfirehî (bi fireyî) | Larghissimo |
| 208 | Bi berfirehî û belavî (belawela) | Largo |
| 209 | Bi berfireyî û xemgînî | Largo emesto |
| 210 | Noteyên Netebat (Nesrewit, nehewiyayî, nehewan) | Leading-note |
| 211 | Qevzdan, (Qevastin, Hilpekîn, Pengizîn) | Leap |
| 212 | Bi girêdanê (bi nermî) | Legato |
| 213 | Bi sadeyî | Leggiero |
| 214 | Xeta alîkar | Legre line |
| 215 | Bi sistî, Bi xavî (Hêdîka) | Lento |
| 216 | Xav (sist-hêdî), lê ne gelek | Lento.ma nan troppo |
| 217 | Bi heman livê yan hevoka pêş | Li stesso tempo |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 218 | Dirêj | Longa |
| 219 | Noteya alîkar a jêr | Lower auxiliary note |
| 220 | Vewestana (vêsana) dirêj | Lunga pause |
| 221 | Desterast | M.D. mano destea |
| 222 | Desteçep | M.S. mano sinistra |
| 223 | Lezpîv | M.M. metronome |
| 224 | Nîv hêmin | mp mezzo piano |
| 225 | Nîv bihêz | mf mezzo forte |
| 226 | Mamnavendî | Moderato |
| 227 | Gelek(pir) | Molto |
| 228 | Sirûda leşkerî | Marcia |
| 229 | Cengî (Şerî) | Marziale |
| 230 | Lê belê | Ma |
| 231 | Madrîgal | Madrigal |
| 232 | Bi dilovanî (Bi piyarî) | Maestoso |
| 233 | Peyjeya mezin | Major scale |
| 234 | Sêyana mezin | Majör 3 rd |
| 235 | Destê rastê (muzîka piyanoyê) | Mano destra |
| 236 | Destê çep (muzîka piyanoyê) | Mano sinistro |
| 237 | Bi agahdarî, bi hişyarî (Bi hayjêbûnê) | Marcato |
| 238 | Bi lêdanê | Martollato |
| 239 | Pîvan | Measure |
| 240 | Navend | Madiant |
| 241 | Awaz | Melody |
| 242 | Peyjeya biçûk a melodiyê | Melodic chromatic scale |
| 243 | Navbera melodiyê | Melodic Interval |
| 244 | Peyjeya biçûk ya melodiyê | Melodic minor scale |
| 245 | Kêmtir | Meno |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 246 | Hinek lez an jî ji allegro girantir (sistir) | Meno allegro |
| 247 | Hinekî tundkirina deng ji nişke ve | Meno forte |
| 248 | Yekser bi sistî (giran) - Di cih de bi sistî (giran) | Meno mosso |
| 249 | Menuet | Menuet |
| 250 | Metronom | Metronome |
| 251 | Nîşaneya metronomê | Metronome mark |
| 252 | Nîv, navend | Mezzo |
| 253 | Kilîta mezo soprano | Mezzo-soprano clef |
| 254 | Qutkirina kêm (Navbira kêm) | Mezzo staccato |
| 255 | Dengên mamnavendî | Mezzo voce |
| 256 | Noteya 'Mî' | Mi |
| 257 | 'Do' ya navîn | Midlle C |
| 258 | Peyjeya biçûk | Minur |
| 259 | Dupar | Minim |
| 260 | Bêhnvedana Duparê | Minim rest |
| 261 | Biçûk | Minor |
| 262 | Peyjeya biçûk | Minor scale |
| 263 | Sêyaniya biçûk | Minor 3 rd |
| 264 | Peyjeya biçûk | Moll |
| 265 | Zêdetir (Bêhtir) | Molto |
| 266 | Zêdetir bi bêhnfireyî | Molto adagio |
| 267 | Mordent | Mordent |
| 268 | Kêmtir | Mosso |
| 269 | Liv (Hereket) | Moto |
| 270 | Elfabeya muzîkî | Musical alphbet |
| 271 | Notandina muzîkî (Notasyona Muzîkê) | Musical notation |
| 272 | Bi hêrs (Bi tûreyî) | Mervoso |
| 273 | Bi asayî (Bi Adetî) | Nobile |
| 274 | Pir nebe | Non tanto |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 275 | Rastok (remza sirûştî) | Natural |
| 276 | Niweym | Neumes |
| 277 | Na | Non |
| 278 | Ne gelek bi lez | Non tanto allegro |
| 279 | Bi hev ve (Bi hev ve zeliqî) | Ostinato |
| 280 | Oboe | Oboe |
| 281 | Octave | Octave |
| 282 | Nîşaneya octave | Octave sign(8va.....) |
| 283 | Çarpar | Ono-beat |
| 284 | Score ya vekirî (open score) | Open score |
| 285 | Orkestra | Orchestra |
| 286 | Gotinbêj (goyende) | Parlante |
| 287 | Giran (Biha) | Pesante |
| 288 | Zêdetir | Piu |
| 289 | Lêdan | Pizzicato |
| 290 | Hinek (Piçek) | Poco |
| 291 | Gelek bi lez | Prestissimo |
| 292 | Bi lez (Zûka) | Presto |
| 293 | Tund ji nişke ve – Xurt ji nişke ve | Piu forte |
| 294 | Girantir wate ji lentoyê bileztir | Piu lento |
| 295 | Yekser bilez (Di cih de bi lez) | Piu mosso |
| 296 | Bi tevayî hêminkirina deng ji nişke ve | Piu piano |
| 297 | Ji presto xurtir | Piu presto |
| 298 | Qor (Tebeqe - Çîn) | Pitch |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 299 | Bi tiliyê | Pizzicato(pizz.) |
| 300 | Stranên olî (ayînî) | Plainsong |
| 301 | Kêmtir (Hindiktir) | Pochettino |
| 302 | Kêmtir (Hindiktir) | Pochetto |
| 303 | Kêmtir (Hindiktir) | Pochino |
| 304 | Kêm | Poco |
| 305 | Hinekî bi bêhna fireh | Poco adagro |
| 306 | Hinekî bi lez | Poco allegro |
| 307 | Berebere (Pile bi pile) | Poco a poco |
| 308 | Ciwar | Position |
| 309 | Pral triler | Paralltriller |
| 310 | Heta karî bi lez | Presto |
| 311 | Heta karî xurt | Prestissimo |
| 312 | Noteya Pêşîn (Dora Pêşîn) | Primo volta |
| 313 | Noteyên serekî | Principal notes |
| 314 | Hûrbeşên Lêdanê | Pulse |
| 315 | Dengê safî (Dengê Zelal) | Pure sound |
| 316 | Bi hev ve (Pevzeliqî) | Qstinato |
| 317 | Çargoşe | Quadruplet |
| 318 | Kêşa çarî | Quadruple time |
| 319 | Siruşt | Quality |
| 320 | Şazdepar | Quarter-beat |
| 321 | Çarpar | Quarter note |
| 322 | Heta radeyekê (hema hema) | Quasi |
| 323 | Heta radeyekê hêdî (giran, sist) | Quasi lento |
| 324 | Heştpar | Quaver |
| 325 | Bêhnvedana heştparê | Quaver rest |
| 326 | Pêncgoşe | Quintolet |
| 327 | Kêşa pêncgoşeyî | Quintuple time |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 328 | Ber bi xavbûnê ve (Ber bi giranbûnê ve ) | Rallentando |
| 329 | Bi lez | Rapidamento |
| 330 | Bi biryar – Bi xurtî | Resolute |
| 331 | Bi liveke derengketî (Bi hereketeke paşketî) | Ritenuto |
| 332 | Berebere ber bi giranbûnê ve (Rade bi rade ber bi hêdîbûnê) | Rallentando |
| 333 | Dengewar | Range |
| 334 | Noteya "Re" | Re |
| 335 | Komkirina Rêzikên Noteyan | Regular grouping of notes |
| 336 | Pêwendî yan jî merivatî | Relative |
| 337 | Dubare | Repetition |
| 338 | Bêhnvedan | Rest |
| 339 | Çareserkirin | Resolution |
| 340 | Rîtîm | Rhythm |
| 341 | Bi hêzkirina deng ji nişkê ve | Rinforzando |
| 342 | Bi çavnetirsî ( bi wêrekî) | Risoluto |
| 343 | Berebere ber bi giranbûnê ve | Riteardando(rit. Riard) |
| 344 | Bi giranî berev hêdîbûnê | Ritenuto (rit. Riten) |
| 345 | Bi tinazwerî (Bi henekî, Bi tinazkî) | Shcerzando |
| 346 | Hişk | Secco |
| 347 | Bi sakarî | Semplice |
| 348 | Herdem (Hergav) | Sempre |
| 349 | Bêyî | Sense |
| 350 | Ciddî (Bi hend) | Serioso |
| 351 | Berebere bi hêz li ser deng | Sforzando |
| 352 | Lêkçûn (lihevçûn - levçûn) | Simile |
| 353 | Bi dil û can (Bi giyan) | Spirituoso |
| 354 | Bi hêminî | Sostenuto |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| 355 | Qetoqeto – Piçir piçir | Staccato |
| 356 | Ji nişkê ve | Subito |
| 357 | Peyje | Scale |
| 358 | Hêdî hêdî lawaz dibe. | Scemando |
| 359 | Bi tinazwerî ( bi henekî) û lîstikê | Scherzanado<br>Scherzoso |
| 360 | Scherzo (muzîka semayî) | Scherzo |
| 361 | Scherzo ji serî ve | Scherzo Da Coppo(scherzo D.C) |
| 362 | Score | Score |
| 363 | Nobeya duyem (Dora duyem) | Seconda volta |
| 364 | Yekpar | Semibreve |
| 365 | Bêhnvedana Yekparê | Semibreve rest |
| 366 | Şazdepar | Semiquaver |
| 367 | Bêhnvedana Şazdeparê | Semiquaver rest |
| 368 | Nîvpaye - Nîvpile | Semitone |
| 369 | Bi sadeyî | Semplice |
| 370 | Bi berdewamî | Semre |
| 371 | Herdem qetoqeto (Herdem bi piçrî) | Simper staccato |
| 372 | Bêyî | Senza |
| 373 | Bêyî girankirinê (Bêyî sistkirinê – Bêyî xavbûnê) | Senza ritarder |
| 374 | Şeşgoşe -şeşko | sextolet |
| 375 | Heftgoşe -heftko | septolet |
| 376 | Kêşa heftî | Sepuple time |
| 377 | Bihêzkirina deng ji nişkê ve | S forzando(sf. Or sfz.) |
| 378 | Lerzîn | Shale or teill |
| 379 | Bilindok | Sharp(#) |
| 380 | Noteya "Sî" | Si (it.,Fr.) |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| 381 | Bi heman awayî | Simile |
| 382 | Navbera Sade | Simple interval |
| 383 | Qetoqetokanî (Qetqetokî) | Simple staccato |
| 384 | Kêşa sade | Simple time |
| 385 | Kêşa sêyanîya sade | Simple teiple time |
| 386 | Şêstûçarpar | Sixteenth-beat |
| 387 | Şazdepar | Sixteenth-note |
| 388 | Şêstûçarpar | Sixty-forth note |
| 389 | Cardî giran dibe | Slendanto |
| 390 | Belawela (Bi belavî) | Slargando |
| 391 | Kevana girêdanê | Slur |
| 392 | Hêdî hêdî ji nav diçe. | Smorzando |
| 393 | Noteya "Sol" | Sol |
| 394 | Sonata | Sonata |
| 395 | Soprano | Soprano |
| 396 | Kilîta "Sol" soprano | Soprano clef |
| 397 | Bi dilfireyî (Bi xwînfireyî) | Sostenuto |
| 398 | Li jêr ( di bin de) | Sotto |
| 399 | Di bin lêvan de hêdîka | Sotto voce |
| 400 | Pêlên deng | Sound wawes |
| 401 | Lezgînî (Tîjrewî) | Speed or tempo |
| 402 | Quta zêde (Qetoqetoya pir) | Staccatossimo |
| 403 | Pêlekan | Stave or staff |
| 404 | Lingê noteyê | Stem |
| 405 | Gav | Step |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 406 | Bi bêhna fireh – (Bi aramî) | Stringendo |
| 407 | Çarîneya Jîdar | String quartet |
| 408 | Jêr (bin) | Sub. |
| 409 | Jêrzal | Subdominant |
| 410 | Bin-navend (Jêrnavend) | Submediant |
| 411 | Li ser ( ji bo amûrên jidar ên kevankî) | Sul,Sull,Sulla |
| 412 | Bikaranîna kevanê nêzikî pira amûrê | Sul Punticello |
| 413 | Jor | Super |
| 414 | Serbingeh | Supertonic |
| 415 | Senfoni | Symphony |
| 416 | Tempo | Tempo |
| 417 | Tempoya guncaw | Tempo giusto |
| 418 | Bi hêminî | Tranquillo |
| 419 | Zêdegavî (Zêderoyî ) | Troppo |
| 420 | Tevahiya Jîdaran | Tutti |
| 421 | Kilîta noteyan | Til of note |
| 422 | Gelek | Tanto |
| 423 | Navên teknîkî | Technical names |
| 424 | Bilez | Tempo or speed |
| 425 | Bi tempoyeke gelekî hûr û têkûz | Tempo guisto |
| 426 | Bi tempoyeke dilşad | Tempo commodo |
| 427 | Bi tempoyeke asayî ne gelekî bi lez | Tempo ordinario |
| 428 | Wekî tempoya yekem | Tempo primo |
| 429 | Tenor | Tenor |
| 430 | "Do" ya tenor | Tenor C |

Institut kurde de Paris

| Jimare | Kurdî | Îngîlîzî |
|---|---|---|
| 431 | Kilîta tenor | Tenor clef |
| 432 | Trombone ya tenor | Tenor trombone |
| 433 | Çarêle | tetrachord |
| 434 | Kevanên bi hev ve | Tie or bind |
| 435 | Rêberê kêşê | Time signature |
| 436 | Dengê cudakar (Dengê jêkcudakar) | Tone of disjunnction |
| 437 | Bingeh | Tonic |
| 438 | Bingeha mezin | Tonic major |
| 439 | Bingeha biçûk | Tonic minor |
| 440 | Hêdîka | Tranquillo |
| 441 | Veguhastin | transposition |
| 442 | Sêgoşe | Triplet |
| 443 | Kêşa sêyî (3) | Tripl time |
| 444 | Bi sitûr | Vigoroso |
| 445 | Bi lez '176' | Vivace |
| 446 | Bi firînê | Volante |

Institut kurde de Paris

## ÇEND AGAHÎ DERBARÊ HUNERMEND DE

Kamîran Îbrahîm ji Rojavayê Kurdistanê ye. Ew di sala 1965'an li gundê Letîfiye ku nêzikî Qamişlo ye ji dayik bûye. Wî di sala 1985'an de dest bi sazbendî û stranbêjiyê kir.

Di sala 1987'an de bawernameya (dîploma) amadehiyê beşa zanistî li Sûryayê wergirt.

Di sala 1988'an de koma muzîkê ya bi navê SINABIL damezrand û beşdarî çend çalakiyên niştimanî û neteweyî kir.

Di sala 1990'î de koma muzîkê ya bi navê BEHAR damezrand.

Berpirsyariya rahênanên koma XELAT ya folklorî kir.

Beşdarî bi sedan şahî û festîvalên gelêrî, neteweyî û niştimanî bûye.

Di sala 2001'ê de xwendina xwe ya hunerî ya muzîkê bi xwendina taybet a wezareta perwerdeyê ya Sûryayê temam kir.

Weke mamostayê buzq, tembûr û baxleme li ser bingeha hunerî ya muzîkê heta sala 2004'an ders daye.

Di sala 2003'an de berhema xwe ya yekem ya bi navê AWAZÊN KESKESOR li ser bingeha hunerî ya muzîkê li Qamişlo derxist.

Di sala 2006'an de berhema xwe ya yekem ya bi navê ÇILAWAZ li Enstîtuya Kelepûra Kurdistanê derxist.

Di sala 2005'an de di Festîvala Muzîkê ya Silêmaniyê de weke jenyarê amûra Bûzqê yê baş xelata rêzlêanînê wergirt.

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Niha berpirsyarê koma muzîkê ya Zanîngeha Selaheddîn e.

Endamê Rêxistina Hunermendên Kurdistanê ye.

Endamê koma muzîkê ya bi navê ZÎRÛBEM ya li Hewlêrê ye.


Wî di sala 2010'an de li fakulteya hunerên ciwan beşa muzîkê ya Zanîngeha Selaheddîn temam kir.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# WANEYÊN MUZÎKÊ

## KAMÎRAN ÎBRAHÎM



Institut kurde de Paris

ISBN 978-605-87650-8-5

9 786058 765085

DİYARBAKIR BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ

Konservatuara Aram Tîgran 2010

Şaredariya Bajarê Mezin A Amedê